



## "Qulingê birîndar yê Kurdistanê"

**JIYANEKE** sirgûnî, îşkencekirî û mayîna bi salan di zindanan de... Seyadê Şamê ji aliyê malbata xwe ve wek mirî dihat zanîn. Dema dengê Seyad di Radyoya Rewanê de olan dide bawerî bi jiyanek ji nû ve vejînandî tê kirin.

RÛPEL 07



## Tama siruştî ya çiyayên Kurdistanê: Kivark

**MEHÊN** biharê li Kurdistanê kivarkên ku mirov ji tama wan têr nabe şîn dibin. Li navçeya Kercewsa girêdayî Êlihê, kivarkên ku piştî baranên biharê derdikevin ser rûyê erdê, ji aliyê gundiyan ve tên komkirin.

RÛPEL 09



## Referandûm û Xoserî

**DEWLETÊ** xo awan kerdiş, yanî xoser bîyayiş yew heqo tebî yo. Her netew heqê xo esto ke dewletê xo awan bikero. Qet heqê yewna netew, yewna yew quwetî çin o ke welatî yew mileta bînî îşqal bikero û îtya îdare bikero. La ewro hema-hema dewletê dinya heme netew-dewlet î.

RÛPEL 10

bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ
Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 21
29 GULAN - 04 HEZÎRAN 2017
www.basnews.com



DYA DI ALARMÊ DE YE S2

# LI ŞENGALÊ METIRSIYA PKK-HEŞDÎ ŞEBÎ

**> DYA: DIVÊ PKK JI ŞENGALÊ DERKEVE**

Jibilî PKKê ku tevî hemû bangên aştiyane yên Herêma Kurdistanê ji Şengalê derneketiye û dibe sedema metirsiyan li ser herêmê, di van demên dawîn de Heşdî Şebî jî di nav hewldanan de ye ku gef û talûkeyan li ser herêmê çêbike.

**> PKK Û HEŞDÎ ŞEBI DIXWAZIN DIBIN YEK**

"Heşdî Şeibî û PKK dixwazin bibin yek û herêmê bixin bin kontrola xwe. Ajandayên PKK û Heşdî Şebî heman ajanda ne. Cihê ku ferman û pere jê distînin heman cih e. Ev her du hêz ji bo Korîdora Şîeyan dixebitin."



**EKREM ÖNEN** >02

Medreseyên kurdî û rola wan di şuûra netewî û ilim de



**HOŞENG OSÊ** >05

PKK û Lêborîn



**MURAD CÎWAN** >12

Reformên arastekiriyên bo desthilatê

S3 ROJNAMEGER RUŞEN ÇAKIR:



## Tirkiye, nikare li pêşiya dewleta Kurdî bisekine

"Tirkiye nikare li pêşiya serxwebûna Kurdistanê bibe asteng. Heta dê wê dewletê bikişîne gel xwe. Herwiha ne DYA û ne jî Ewropa li dijî referandûma serxwebûna Kurdistanê dernetin e.

S4 KONGREYÊN HDP û AKPê



## 'Welatê Hevpar' û 'Yek Milet' tên çi wateyê?

Di dema referandûmê de jî HDPê banga dengê 'Na' kiribû û bal kişandibû ser 'welatê hevpar' HDPê, dirûşmeya 'Na', "Ji bo Komara Demokratîk û Welatê Hevpar" bikar anîbû.

S5 TÊMÛRÊ XELÎL



## Radyoya Rewanê bi mîlyonan Kurd şiyar kir

Di dem û dewranên ku têlêvîzyonên Kurdî li cihanê tunebûn, radyoyên Kurdî jî pir kêm bûn, dengê radyoya Rewana Ermenîstanê di karê hişyarkirina gelê Kurd de li tevhiyê Kurdistanê û cihanê roleke pir mezin lîst.



EKREM ÖNEN

## Medreseyên kurdî û rola wan di şuûra netewî û ilim de

Dîroka medreseyên kurdî digihêje demên Selaheddînê Eyyûbî, medreseyên Kurda di wê demê de hatine avakirin. Di vê demê de medrese di nava Kurdan de belav dibin û bi xwestina Selaheddînê Eyyûbî zimanê xwendina medresa dibe bi kurdî. Her çiqas car caran hinek ullemayên Kurd berhemên xwe bi Erebî nivîsandine ji ber wê gelek caran wek ullemayên Ereb hatine nas kirin jî, lê ullemayên Kurd gelek bûne alîkar ne bes di pêşketina îslamê di warê ruhanî de her weha gelek bune alîkar di pêşketina astronomî, matematîk, fîzîk, kîmya, biyolojî, dîrok, edebiyat û hwd. wek eşkereye ji çavkaniyên Kurdan û xerîban li gor çavkaniyên heta niha di destê me de hene medresa pêşîn Baba Tahir Hemedanî li rojhilatê Kurdistanê li Hemedanê avakiriye, heta şerê cîhanê yê yekemîn li Kurdistanê gelek medrese hebûne. Wek medreseya Cizîrê Medresa Sor, medreseya Muksê Hesenê Welî Beg, Medreseya Şehrezor (Silêmanî), Medreseya Şemzînanê, li Wanê a Şikal û a Bedîûzaman Seîdê Nursî, li Bedlîs Hîzanê a Xeyda, li Sêrtê a Mela Xelîlê Sêrtî, her weha li Bazîdê, Colemergê, Bedlîsê, Norşîn, Muş, Oxin, Silîva, Diyarbekir, Musul û li Zaxo medreseyên bi nav û deng hebûn.

Di serdema Komara Tirkiyê de bi qanûna Tevhîd-î Tedrîsat (3 Adar 1924) medreseyên li nav Tirkan hatin girtin lê ên li Kurdistanê karê xwe bi dizî dewam kirin. Dewletê ji bo bikaribe rê li ber karê medreseyên li Kurdistanê bigre bê perwa êrîş anîn ser ullemayên Kurd ew girtin, surgûn kirin kuştin û talan kirin a herî girîng berhemên wanî ku li ser esasê sedê salan hatibûn nivîsandin dest danîn ser û gelek ji wan şewitandin. Mirov dikare bêje kemalîstan di bin navê sekularîzmê de dest pê kirin şaristaniyek ku bi sedê salan hatibû avakirin xwestin ji ortê rakin. Ji ber gelek berhemên ullemayên Kurd ên ku di van medreseyan de xwendibûn û di warê astronomî, matematîk, fizîk, kîmya û hwd bûbûn pispor, malên hemû mirovatiyê bû. Lê pir heyf kemalîstan ev berhem hemû şewitandin. Yek ji sebebên esasî ew bû ku ji ber bêhtirê van berheman bi kurmancî bûn. Her çiqas medrese dergehekî ruhanî bû lê navenda pêşketin û parastina ziman, edebiyat û dîroka kurdî bû. Her weha navenda pêşketina zanist û rewşenbîriya kurdî bû.

Dewleta Tirk ji bo bikaribe Kurdan asîmîle bike ‘îmam hatîp lîsesî’ vekirin her çiqas tê gotin ku ‘îmam hatîp lîsesî’ di sala 1951ê bi hatina Demokrat Partî a li ser hikum vebûye jî lê di rastiya xwe de ‘îmam hatîp lîsesî’ kokê wê digihê sala 1928an di serdema CHPê de wê demê 30 ‘îmam hatîp lîsesî’ hatine vekirin bi vekirina ‘îmam hatîp lîsesî’ xwestin Kurdan asîmîle bikin û melayên Kurd fêrî Tirkî bikin lê siyaseta wan bi ser neket ji ber Kurdan her dixwestin li ullemayên Kurd ku ji medreseyên Kurdî derketibûn guhdar bikin. Bes piştî sala 1965an bi biryara dewletê, qadro kirina melan ji alî Serokatiya Diyanetê ve bê kirin, ji wê demê pê de siyaseta wan a asîmîlasyonê tesîra xwe rê da û heta niha ev tesîr berdewame. Di civata Kurdan de, di warê civakî de tesîreke pozîtîv a ullemayên Kurd li ser civatê hebû û civata Kurd bi tesîra ullemayên Kurd di pirsên moral û etîkê de civateke gelek bi rêk û pêk bûn. lê siyaseta asîmîlasyonê tesîrek negatîv li civata Kurd kir û ew ji gelek nirxên wan ê civakî ên hêja bi dur xistin.

Di van medreseyan de bingehê edebiyata kurdî hate damezirandin, kesen wek: Şex Elî Herîrî, Mela Ehmedê Huseynê Batê, Mela Ehmedê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Feqî Reşîdê Hakkarî, Şerefxanê Colemergî, Selîm Suleyman, Mela Xelîlê Sêrtê, Pertev Begê Hakkarî, Xarisê Bedlîsê, Mela Yunusê Herqetanî û hwd. li van medereseyan perwerde bûbûn.

Her weha di van medreseyan de bingehên netewebûna Kurdan hatiye damezirandin. Di van medreseyan de îdeologê netewebûna Kurda Ehmedê Xanî û her weha gelek zanayên kurdperwer ên wek Murat Xanê Bazîdî, Mela Mehmudê Bazîdî, Mela Seîdê Kurdî (Bedîûzaman), Mela Şexmusê Hesarî (Cegerxwîn) û hwd. perwerde bûne.

Di van medresan de serokê serhildanên Kurdan ên wek Şex Ubeydullahê Nehrî, lawê wî Seyîd Abdulqadir, Mela Selîmê Hîzanî ku bi eslê xwe ji Çewlikê qeza Kanîreşê ye, Şex Şehabeddîn, Şex Elî, Şex Seîdê Pîranî, Şêx Ebdulselam, Mela Mistefa Barzanî û geleke din jî perwerde bûne. Lê dema mirov li van serokên tevgerên Kurda ên dîndar dinere dervî Şêx Mehmûdê Berzencî temamê wan Neqîşbendîne bê guman hêjayî lêkolîneke zanistiye ku li ser vê bê kirin. Lê bi qasî mirov dibîne di Neqîşbendiyê de netewebûn û welatperwerî cihekî girîng digre, ev ne bes ji bo Kurdan weha ye wek mînak Şêx Şamilê Çeçana piştî bûye Neqîşbendî li hember Qeyserê Rûsan serî hildaye.

DYA di alarmê de ye

# Li Şengalê metirsiya PKK-Heşdî Şebî



Jibilî PKK ku tevî hemû bangên aştiyane yên Herêma Kurdistanê li Şengalê derneketiye û dibe sedema metirsiyan li ser herêmê, di van demên dawîn de Heşdî Şabî jî di nav hewldanan de ye ku gef û talûkeyan li ser herêmê çê dike. DYA jî ku rûdanên li herêmê ji nêz ve dişopîne, eşkere dike ku divê li derveyî Pêşmerge, tu hêzeke din li Şengalê nemîne.



CESÎM İLHAN

**WEZARETA** Karên Derve ya DYAyê, di daxuyaniya xwe ya li ser hebûna PKK ya li Şengalê û aloziya li herêmê, diyar kir ku hebûna PKK li Şengalê li pêşiya vegera Şengaliyan bo cih û warên xwe astengî ye û ji ber vê yekê divê PKK ji Şengalê derkeve. Nunerê Êzidiyan li Parlamentoya Kurdistanê ji Heftenameya Basê re ragihand ku Heşdî Şebî û PKK li Şengalê dixwazin hêzên xwe bikin yek û dibêje ku ev wê bibe karesatên nû li ser serê Êzidiyan. Berpirsê Laleşê Dr. Silêman Qanu jî eşkere kir ku talûke û tirsa wê yekê heye ku Heşdî Şebî, Sîba Şêxderî, Girezîr, Tel Benat, Rambûsî, Qabûsî, Hatimiye, Guçu, Tel Qeseb û gelek herêmên Kurdî yên din radestî PKK bike.

**“Şengal ne cihê PKK ye”**

Nunerê Cîgirê Wezîrê Karên Ewrasya û Ewropa yê Wezareta Derve yê DYA Jonathan Cohen jî destnîşan kiribû ku ‘bi dildarî an bi awayekî din’ divê PKK ji Şengalê derkeve. Herwiha Cohen diyar ragihandibû ku Şengal ne cihê PKKê ye û ji bo çareserkirina vê meseleyê hevdîtinên wan bi Hewlêr û Bexdayê re berdewam dikin. Wezareta Karên Derve ya DYA jî diyar kiribû ku ew ji rewşa ji ber hebûna PKK ya li Şengalê hayîdar in û Şengal ne cihê PKKê ye.

**Îddiayên “PKK li Şingalê tunelan dikole”**

Çavkaniyeke leşkerî li Şingalê ji rojnameya me re ragihand ku Heşdî Şeibî li hember mîhwer in ku ev du sal e Pêşmerge li gundên Til Benat û Til Qesebê çekdarên xwe zêde dikirin mîhwerên xwe yên şer ava dikir. Ev yek li dijî rêkeftina Hewlêr û Bexdayê ye. Heman çavkanî destnîşan dike ku dema Tirkiye êrişî Şingalê bike PKK gelek Gerilayên xwe biriye ser Çiyayê Şingalê û ji bo şer amadekariya kolana tûnelan kiriye.

**DYA berê jî hişyar kiribû**

DYA çend caran bi fermî ji PKK xwest ku PKK ji Şingalê derkeve lê pirsgirêk hê jî didomin. Li gor Nûçeya Heftenameya Basê berî niha jî bi raya giştî re parve kiribû Berpirsyarên DYA ji PKK re gotibûn: “Eger armanca we tevgera hêzeke bi pere ya Îraqî be, Îdareya Amerîka vê yekê tevgereke dijminahî dibîne. Ji ber ku di belgeyên di destê me de Bexda, bi daxwaza Îranê ev plan xistiye rojevê. Her wiha Artêşa Qudsê a di bin îdareya Qasim Suleymanî de zextê li berpirsyarên Îraqî dike. Planeke wiha tu carî nayê pejirandin.

**“Armanca PKK û Heşdî Şeibî wek hev e”**

Nûnerê Êzidiyan li Parmentoya Kurdistanê Şêx Şamo ji Basê re axivî. Şamo dibêje: “Heşdî Şeibî û PKK dixwazin bibin yek û herêmê bixin bin kontrola xwe. Ajandayên PKK û Heşdî Şeibî heman ajanda ne. Cihê ku emir û pere jê distînin heman cîh e. Şêx Şamo dibêje: “Ev her du hêz ji bo Korîdora Şîeyan dixebitin. Ev projeya Şîeyan e. Suriye, Hizbûllah, Yemen, Filîstin û hemû deverên di ajandaya Îranê de hene daxilî vê projeyê ne. Divê rê li pêşiya metirsiyên ji PKK û Heşdî Şeibî bên were girtin. Şêx Şamo wiha didomîne: “Hebûna PKK li Şingalê û hatina Heşdî Şeibî ji bo Şingalê temamkirina projeya Şîeyan ku li dijî Hêzên Hevpeymanê, DYA û Herêma Kurdistanê ye. Eger PKK û Heşdî Şeibî terka Şingalê nekin ev ne îhtimalek dûr e ku Êzidî dîsa bi karesateke nû re rû bi rû bimînin. Ji bo vê yekê divê rê li ber van hêzên xeternak bê girtin. Li deverên ku Heşdî Şeibî dimîne ne dûrî baregehên PKK ye. Hevgirtina van baregehan bi armanca kontrolkirina Şingalê ya PKK ye. Ji ber ku PKK, wisa difikire ku dê Heşdî Şeibî cihên di bin destê xwe de teslîmî PKK bike. Ew jî ji aliyê Şîeyan ve wek aliyekî Heşda Şeibî tên zanîn û bi giştî jî daxilî bernameya Heşdî Şeibî ne.”

Herwiha li gor rêkeftina Herêma Kurdistanê û Îraqê dê Pêşmerge cihên ku diyar kiriye kontrol bike û deverên din jî piştî şerê Mûsilê dê di bin kontrola Artêşa Îraqê de bin lê Heşdî Şeibî cihê Artêşa Îraqê dagirtiye.

**Heşdî Şeibî mîhwer ava dike**

Fermandarê Pêşmerge li Şingalê Qasim Dirbo jî dibêje, Heşdî Şeibî li hember mîhwer in ku ev du sal e Pêşmerge li gundên Til Benat û Til Qesebê çekdarên xwe zêde dikir mîhwerên xwe yên şer ava dike. Qasim Dirbo dibêje: “Li gor rêkeftina Hewlêr û Bexdayê divê Heşdî Şeibî ji van deveran vekişe. Avakirina mihwerên Heşdî Şe-ibî li Şingalê metirsîdar e. Em qebûl nakin tu hêz were herêma Şingalê. Tenê hêza Pêşmergeyên Kurdistanê dê Êzidiyên Kurd biparêze.”

**“Gelê Şingalê ji bilî Pêşmerge tu hêzan naxwaze”**

Qaymeqamê Şingalê Miheme Xelîl dibêje; Hemû pirsgirêk bi êrişa PKK ya li ser Pêşmergeyên Roj ku ber bi herêmê ve diçûn dest pê kir.” Xelîl: “Hebûna PKK li Şingalê bi hevgirtinan re dê ji bo Pêşmerge pirsgirêk derxîne. PKK dest bi kolana xendekan kiriye. Hatina Heşdî Şeibî bo herêma me li dijî rêkeftina Hewlêr û Bexdayê ye. Her wiha gelê Şingalê jî naxwaze ji bilî Pêşmerge tu hêz wan biparêze.”

## DYA: Hebûna PKK li Şingalê astengî û metirsî ye

Cîgirê Serfermandarê Pêşmergeyê Kurdistanê Salar Mihemed Cebarî, me îhtar kir ku bihostek jî nekeve nav axa Kurdistanê. Hatin, bi hebûna PKK li herêmê ve girêdayî ye. Konsolê DYA yê Îraqê Doglas Siliman jî gotibû: “Hebûna PKK li Şingalê cihê nîgeraniyê ye. Siliman, ji bo bi saziyên Îraqî re tevbigere zagon hatibû derxistin û emirstandina ji derve metirsî ye.”

## Bexda, PKK girêdayî Heşdî Şebî dibîne

Endamê Meclîsa Navçeya Şingalê Xeyrî Zîban jî dibêje: Hatina Herêma Şingalê dê bibe sedema rûdanên siyasî. Bexda hê jî li Şingalê piştgirî dide PKK û wan girêdayî dibîne. Ji ber vê yekê dibe ku rê bide PKK da ku were li Herêma Êzidiyan bê bicih bibe. Em hêvîdar in tirsa Êzidiyên Kurd rû nede. Em dixwazin tenê Pêşmergeyên Kurdistanê li Şingalê bimînin û hemû hêzên din terka Şingalê bikin. Tenê Pêşmergeyên Kurdistanê Êzidiyan diparêze û ji bo vegera Êzidiyan li ser warê xwe dixwaze hizûrê ava bike.



“Heşdî Şeibî û PKK dixwazin bibin yek û herêmê bixin bin kontrola xwe. Ajandayên PKK û Heşdî Şeibî heman ajanda ne. Cihê ku emir û pere jê distînin heman cîh e.Ev her du hêz ji bo Korîdora Şîeyan dixebitin. Ev projeya Şîeyan e. Suriye, Hizbûllah, Yemen, Filîstin û hemû deverên di ajandaya Îranê de hene daxilî vê projeyê ne. “

Rojnameger Ruşen Çakır:

# Tirkiye, nikare li pêşiya serxwebûna Kurdistanê bisekine





RABİA ÇETİN



## RUŞEN ÇAKIR

Rojnameger Ruşen Çakır, li ser serdanên derve yên yekem ên Serokê DYA'yê Donald Trump, rêkeftina çekan a ligel Erebîstana Siûdiyê, îddîayên 'NATO'ya Ereban' biçekkirina YPG'ê, rewşa Kurdên Sûriyê û biryara pêkanîna referandûma serxwebûnê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê bersiva pirsên me da.

**We di nivîsa xwe ya li ser serdana Trump a bo Erebîstana Siûdiyê, ragihandibû ku divê Tirkiye têkilî (angaje) tifaqa nû ya di navbera DYA-Îsraîl û Erebîstana Siûdiyê nebe. Çima gelo?**

Di navbera Îran û welatên Kendavê de rikberiyek heye. Meseleyeke Îranê heye bo berfirehkirina Şîîyan li herêmê. Û hema bêje di hemû welatên Kendavê de gelheyeke Şiiyan heye. Ji ber ku Îran jî bi riya vê nufûzê şiiyan dixwaze û hewl dide ku bi riya vê nufûzê kontrola xwe ya li herêmê fireh bike, welatên Kendavê jî de-stebalîze bike. Lewma ji şoreşa Îranê û vir ve tirseke welatên Kendavê heye. Di dema êrişkirina Îraqê bo ser Îranê de jî bandora welatên Kendavê heye. Trump jî beriya ku were, ewilî ji serdemên Bush û dîsa kurê wî Bush gelek zêdetir dijberiya xwe ya li dijî Îranê anî ziman. Rexneyên tund li rêkeftina Obama a nukleerî kirin. Di kesên derdora Trump de jî dijberiyeke cidî heye. Ji ber wê yekê di rojên bê de îhtîmal heye ku rêveberiya DYAyê ya nû li ser Îranê bisekine. Ji bo Îsraîlê jî Îran metirsiyeke mezin e. Li herêmê dijminê hevpar yê Erebîstana Sîûdî û Îsraîlê, Îran e. Serdana Trump a li pey hev bo van herdu welatan jî dibe ku bibe destpêka proseyeke sînordarkirin û dorpêçeke li dijî Îranê. Dê li dijî bikaranîna Şîîtiyê jî aliyê Îranê ve, wê mîhwereke Sunnî bê avakirin. Bi awayekî kismî li Sûriyê jî ev hatibû ceribandin. Bi awayekî dê hewl bidin ku Tirkiyê bêxin nav vê mîhwerê. Eger ev stratejî bicî bibe, him DYA him Siûdî û him jî Îsraîl wê daxwazê li Tirkiyê bikin ku helwesteke li dijî Îranê bistîne. Gelek birîsk e ku Tirkiyê biqasî wan di-jberî Îranê be. Li herêmê qelsbûna Îranê, di eleyha Tirkiyê de ye jî. Fatûreke giran ji rûdanên li Îraq û Sûriyê giha Tirkiyê. Îran jî li vê xelekê zêde bibe, herêm wê bi tevahî zeîf bibe. Ji ber wê yekê eger ji destê Tirkiyê bê divê ji van hewldanan re bibe asteng, eger nikare vê yekê bike jî divê bêalî bimîne.

**Gelo Tirkiye wê notr bimîne?**

Dibe. Berê mabû. Di serdema Bush de ma. Di serdemeke ku herkesê Îran û Sûriyê weke 'Sêgoşeya fitnê' binav dikir, Tirkiyeyê him bi Tehranê re û him bi Îamê re têkiliyên baş danîn. Heta şerê navxweyî yê Sûriyê pêwendiyên bi mal-bata Esad re gelek baş bûn. Di wê demê de jî navbera Esad û DYA - Îsraîlê ne baş bû. Tirkiyê dixwast wan li hev bîne. Di rûdana krîza nukleerê de Tirkiyeyê ligel Brezîlya li NY, piştevaniya Îranê kirin. Nikare ligel Îranê bimîne, lêbelê notr-mayîna wê, ya herî îdeal e.

> Serkeftiyê şerê navxweyî yê Sûriyeyê tenê Kurd in. Dê bikaribin vê yekê bixin bin garantiyê nayê zanîn lê pêşeroja hemahengiya stratejîk ligel DYAyê girîng e. Ji bo dewama vê hemahengî û tifaqê jî divê meseleya Qendîlê jî were rojevê. Dibe ku DYA, heta têkbirina DAIŞê têkiliyên YPGê ên ligel Qendîlê paşgûh bike lêbelê piştî radeyekê nikare vê yekê ji nedîtî ve were.

**We qala avakirina mîhwereke Sunne li dijî xîlala Şîî kir. Gelo dibe ku ev yek di pêşerojê de veguhezê karîgeriyeke wek Bihara Ereban?**

Niha li erdnigariya Îslamê li deverên cuda, li Pakîstan, Îraq û Sûriyê pevçûn rû didin. Tenê ji ber ku ne Şîî, mirov ji aliyê DAIŞê ve tên kuştin. Mizgeftên Şiiyan tên teqandin. Tişta herî xerab ew e ku şerekî di navbera Şîî – Sunneyan de li seranserê herêmê belav bibe. Eger ev pêkwere, herêm wê serobino bibe. Mîna demekê li Bosna- Herseke dibe ku em şahidiya mirovên ligel hevdu bikin ku bibin dijminên hev. Ji xwe niha li Efganîstan, Pakîstan û Îraqê em rastî bûyerên bi vî rengî tên. Yanê eger tiştek wiha biqewime wê rewş gelek xerab bibe.

**Trumpê ku propagandayên xwe yên hilbijartinê li ser 'Dijberiya Îslamê' ava kir, serdana derve ya yekem bo Erebîstana Siûdiyê û rêkeftineke çekan a ku ji 110 milyar dolaran pêk tê, em dikarin weke avakirina 'NA-TO'ya Ereban' bixwînin?**

Tu rastiya avakirina Artêşeke Ereban ligel Erebîstana Siûdiyê nîn e. Ji bo ava-kirina Artêşan pêwîstî bi însanan heye. Hêzeke mezin ya Erebîstana Siûdiyê tune ye. Dikare ji aliyê çekan ve alîkariya vê yekê bike. Di demên cuda de tiştên bi vî rengî tên rojevê, lêbelê ji bo avakiri-na artêşeke wiha pêwîstî bi tevlîbûna Tirkiye û Misrê heye. Artêşeke ku Tirkiye û Misir ne di nav de bin ku navbera herduyan jî niha nebaş e, herî zêde em dikarin weke leşkeriya bipere binav bikin. Lê ya ku niha xuya dike, Trump hindî ku jê dixwaze kêşeyên li cîhana Îslamê li gor xwasteka xwe bi wan bi de çareserkirin. Hejmara welatên vê yekê pêk bîne kêm e. Dewletên mîna Erebîsta-na Siûdiyê ku ne bihêz in, dikarin vê yekê bikin. Ev poîtîkayeke wisa ye ku zêde nikare bimeşe.

**Hûn pêwendiyên DYAyê yên bi Tirkiye û Kurdan re ku bi du kartan dilize û dev ji herduyan jî bernade çawa dibînin?**

Ev pirseke dijwar e. Bi mehan e herkes li ser vê pirsê difikire. Ji ber ku DYA dewleteke bihêz e, dikare bêje 'dikarim vê yekê jî bikim û viya jî bikim'. Lêbelê yên din nikarin vê yekê bêjin. Li Sûriyê niha ya xuya dike ew e ku YPG/PYD însiyatîf girtiye destê xwe. Tevî Tirkiyeyê ku hevalbenda NATOyê ye, bi DYAyê re pêwendiyên stratejîk ava dike.

**Garantiya ku wê DYA dev ji Kurdan bernede heye?**

Îhtimal heye berde. Ev yek di demên borî de jî pêk hat. Dibe ku Kurdan jî ji dîrokê ders standibe. Herwiha em di re-wşeke demkî de ne. Têkbirina DAIŞê ser-eke ye. Ev têkbirin dibe proseyeke nû jî bide destpê kirin. Lê ev dem dê ne deme-ke hêsan be. Têkbirina DAIŞê dê bi serê xwe zehmet be. Unsûrên mîna DAIŞê dê dewam bikin. Rewşa KurdênSuriyeyê, Erebên Sune, Erebên Şia dê çawa be ne diyar e. Lê belê tevî hemû rûdanan jî li Suriyeyê hejmara herî hindik a Kur-dan e lê destkeftiyên herî mezin jî yên Kurdan in. Wan jî gelek mirovên xwe winda kirin, lê hemû Suriyeyê winda kir. Li Suriyeyê grubên ligel rejîmê jî yên li hember rejîmê jî gelek zaiyat dan. Û her du aliyan jî tu tişt bidest nexist. Kurdan li gor yên din kêm berdêl dan lê destkef-tiyên wan ji yên din zaftir in. 3 Kanton ava kirin. Dixwazin van bigihijînin hev. Herwiha di şerê nav xwe yê li Suriyeyê de tenê Kurd serkeftî ne. Dê bikaribin vê yekê bixin bin garantiyê nayê zanîn lê pêşeroja hemahengiya stratejîk ligel DY-Ayê girîng e. Ji bo ev hemahengî bidome jî divê mijara Qendîlê neyê rojevê. Dibe ku DYA, heta têkbirina DAIŞê têkiliyên YPGê ligel Qendîlê piştgûh bike. Piştî demekê DYA dê piştgûh neke wê têkiliyê.

**Dema DYA çek da YPGê 'Herêmên Ewle' hatibûn îlan kirin û Tirkiye êriş biribû ser Şingal û Rojava. Ev hewlek li dijî Tirkiyeyê ye?**

Êrişa Tirkiyeyê bi armanca rawestindi-na biçekkirina YPGê hat kirin. Lê ev yek dijî mabesta Tirkiyeyê tesîr kir û DYA, di demeke kin de YPGê biçek kir. Tirkiye li wir xeletî kir, divê bidîta dê tu tişt ji van êrişan dernekeve. Karta êrişê zû bikar anî, mirov bi mirina xwe man. Fonksiyo-na van êrişan nebû.

**Gelo ji bo vê êrişê diviyabû plan bi-hatana çêkirin; yanî êriş mecbûrî bû?**

Ez nabêjim ev karteke baş e. Tirkiye bi xwe ev yek wek kart bikar anî. Ji serî de helwesta Tirkiyeyê li dijî Kurdên Suriy-eyê xelet e. Di demekê de hevdîtin pêk anîn lê paşê polîtikaya xetên sor derket rojevê. Heta ji xetên sor dernekeve jî çareserî nayê.

**Dikarin dev ji polîtîkaya xetên sor berdin?**

Dibe, çima nebe. Tirkiye welatekî ku hevdîtinên Oslo û Îmralî kiriye. Ev jî bê îmkanbûn lê bûn. Di teoriyê de dibe. Lê niha nafikirim ku bibe.

**Di rojevê de niha Reqa heye. Kurd çima ji bo Reqa şer bikin?**

Di encama şerê Reqayê de ji DYAyê çek distîne, dibe şirîk, meşrûiyet distîne. Ev danûstandinek e. Li Suriyeyê di-jminê herî sereke yê Kurdan DAIŞ e. Bidestxistina navenda DAIŞê dê li gor berjewendiyên Kurdan be. Dikaribûn lihevhatinekê jî pêk bînin. Lê di encama operasyona Reqayê de dê destkeftiyên mezin bidestbixin. Îhtimal e di demên bê de zirar jî jê bibîne.

**Gelo rewşa Kurdên li Tirkiyeyê; guftogoyên destpêkirina hevdîtinên nû tê kirin?**

Hin alî niyet dikin 'dê ji nû ve dest pê bike' lê ez îhtimal nadimê niha. Her tişti girêdayî Tayyip Erdoğan û nirxandinên wî ne. Di kongreya dawî de jî me tu îşaret di vê mijarê de nedît. Di vê astê de ji bo Erdoğan û Qendîlê mijara sereke Suriye ye. Bûyerên li wir dê li Tirkiyeyê encam bidin. Bûyerên li Tirkiyeyê jî ji bo Suriyeyê bûn. Şerê nikaribûn li Suriy-eyê bikin hatin li Tirkiyeyê kirin her du aliyan.

**Yanî Kurdên Tirkiyeyê bo Suriye bûn qurbanî?**

Ev nirxanidineke vala ye bi min. Dema mirov, li dema şerê xendekan dinêre li Tirkiyeyê her tişt rawestiyabû. Li Tirki-yeyê paşdeçûnek derket holê li Suriyeyê Kurdan ligel Amerîka hevpeymaniyeke stratejîk ava kir. Şer li vê axê çêbû lê rûdanên girîng li Suriyeyê derketin holê. Tirkiye enerjiya xwe da hûndirê xwe. Ji bo hemû Kurdan jî tiştê girîng niha Kurdên Suriyeyê ne. Di medyaya cîhanê de jî ev wisa ye. Kurdên Suriyeyê rojevê diyar dikin. Pevçûnên li Tirkiyeyê tu carî nebûn rojeva cîhanê. Xisarên pir mezin çêbûn lê neketin rojeva medyaya cîhanê.

**Yek ji sedema bêdengiya cîhanê li hember pevçûnên li Tirkiyeyê karta penaberan e gelo?**

Erê Ewropa Tirkiye rexne nekir lê me-dyayê jî rexne nekir. Li aliyekî hevpey-vînên ligel YPGê binêrin li aliyê din jî dokumantên li ser Kurdên Tirkiyeyê... Pir pê re eleqedar nebûn. Dema mirov dibêje kêşeya Kurdî, Suriye tê bîra miro-van niha. Ji bo Kurdên Tirkiyeyê jî ev wisa ye. Dema Kobanî li hember sekna Enqere Kurdên AKPyî xeyîdîn û xwe paş ve dan. Ev mirov li hember hemû rûdanan ligel AKPê bûn. Niha li cîhanê di navenda kêşeya Kurdî de Suriye heye. Hemû rûdanên di derheqê Kurdan de rû didin di bin siya Suriyeyê de ne.

### Bi jargona Tirkan, Kurdên Bakurê Îraqê jî hene. Sekna li hember Kurdên Suriyeyê diyar e. Gelo Tirkiye dê dewletbûna Başûrê Kurdistanê bipejirîne?

Salek du sal berê di dema pêvajoya çareseriyê de dibû aciz nebe. Lê di konjoktora niha de razî nabe. Ji ber ku dê jê re bêjin 'Ji dewletê razî yî çima ji Kantonan ne razî yî.' Eger li wir dewleteke Kurdî ava bibe dê bibe. Tirkiye nikare bibe asteng ji vê re. Heta dê wê bikşîne gel xwe. Lê niha îktîdarê zimanê xwe bi Tirkîtiyê re tund kiriye, niha razî nabe. Her wiha mijara serxwebûnê jî tevlîhev e. Ji kengê ve bilêv dikin.

Tekoşîna li hember DAIŞê îlankirina serxwebûnê paşxistin ev yek ne normal e?

Elbet ne hêsan e. Tekoşîna li hember DAIŞê heye. Pirsgirêkên aborî hene. Dema serxwebûn îlan kir serî li hember Îran, Îraq û Suriyeyê jî radike. Bingeha vê serhildanê tune ye. Hêza aborî heta ciyekî tê qebûl kirin. Îran, li hember Kurdên Îranê serxwebûna xwe îlan nekin dibe êrişî herêmê bike. Dê kî Başûrê Kurdistanê ji van êrişan biparêze.

Li hember bilêvkirina serxwebûnê, ne ji DYA ne jî ji Ewropayê deng derneket...

Çi xêra Ewropa jê re heye gelo. Di serî de tişta siyasî bê kirin. Divê aktorên li herêmê qanî bike.



# 'Welatê Hevpar' û 'Yek Milet' ji bo Kurdan tê çi wateyê?



DERYA KILIÇ

Li navenda siyaseta Tirkiyeyê, li Enqereyê, hefteya din du kongre pêk hatin. HDP di kongreya xwe ya derasayî de hevseroka xwe ya nû hilbijart. Piştî ku cezaya Fîgen Yuksekdağa ji 4'ê mijdarê ve girtiye hat pejirandin, HDP mecbûr ma ku hevseroka nû hilbijêre. Kongreyeke din jî ya AKP bû. Piştî referandûma 16'ê Nîsanê pêşiya Serokkomariya bi Partî vebibû. Di 21'ê Gulanê de Serokkomar Recep Tayyîp Erdoğan di kongreya derasayî de vegeriya serokatiya AKP. Di her du kongreyan de jî peyamên bi dilê Kurdan nehatiye dayîn.

Erdoğan, di kongreya derasayî ya sêyem de binê 'Yek milet' xêzkir û wiha domand: "Yek milet, yek al, yek welat û yek dewlet ketiye rêziknameya partiya me. Her kî dev bavêje van xalan dest avêtiye heysiyeta miletê me. Ev yek dê bi vî awayî bikeve rêziknameya AKP." AKP, di berdewamiya dewleta me de dustûra 'Mirovan bijîne da ku dewlet jî bijî' dê bike navenda siyaseta xwe. "Hemû ferdên milet, tu cudahî di navbera wan de nayê qebûlkirin û her kesek hemwelatiyê me yê sereke ye. Hemû welatiyên Komara Tirkiyeyê yek miletî temsîl dikin. Ala me sembola serxwebûna me ye. Ev ax, emaneta şehîdên me ye ku em bi awayekî azad li ser dijîn. Ev ax bi xwîna şehîdên me bûye dewleta me. Dewlet, berhema hevpar a miletê me ye. AKP, di bin van mijarên sereke de nêrîna 'yek milet, yek al, yek welat, yek dewlet' ji xwe re bingeh pesend dike."

Li aliyê din Berdevkê HDP Parlementer Osman Baydemir, nameya Hevserokê HDP Selahaddîn Demirtaş ku ji bo kongreya 3. şandibû xwend. Di nameyê de Demîrtaş balê dikişîne ser 'Welatê hevpar' û 'Nirxên Komariyê' û wiha didomîne: "Xeyalên me, îbadetên me, îdeolojiyên me, stranên me, horonên me, diayên me tev li ser jiyana hevpar û aşitiya civakî ne. Divê em ji bo van tiştan gavên berbiçav bavêjin. Di siyasetê de cesaret ev e. Hêviyên aşitiyeke mayînde me bi zor û zehmetiyan ava kiriye. Herî dawî jî em pir nêz bibûn, mixabin li Dolmabahçeyê ev hêviya me têk birin. Lê divê em bi dengekî bilindtir banga aşitiyê bikin. Ev yek jî bi normalîzekirina nirxên komariyê, rastkirina xeletiyên komariyê û demokratîkkirina komariyê mimkûn dibe. Ji bo komareke demokrasiya wê xurt, hemwelatiya wekhev, welatê hevpar, jiyana wekhev û bi biratî, bê tirs, wek dostan divê em hev hembêz bikin û we tevan vedxwînim cesaretê." Peyama Demîrtaş a dawîn ne nû ye. Ji ber ku di dema referandûmê de jî HDP banga dengê 'Na' kiribû û bal kişandibû ser 'welatê hevpar' HDP dirûşmeya "Na, Ji bo Komara Demokratîk û Welatê Hevpar" bikar anîbû.

Çavkaniyên ku ji Basê re axivîn, tiştekî mîna proseya çareseriyê di demeke nêz de nabînin û sedema vê yekê jî geşepêdanên li Rojhilatanavîn in. Parlementerê HDP yê Wanê Adem Geverî û Rojnameger û Nivîskar Yaşar Aydin ji Basê re gotinên 'Welatê hevpar' û 'Yek Milet' nirxandin.



> "Xeyalên me, îbadetên me, îdeolojiyên me, stranên me, horonên me, diayên me tev li ser jiyana hevpar û aşitiya civakî ne. Divê em ji bo van tiştan gavên berbiçav bavêjin. Di siyasetê de cesaret ev e. Hêviyên aşitiyeke mayînde me bi zor û zehmetiyan ava kiriye.



## "Maf û azadiya Kurdan di bin siya yek welatî de nayê nirxandin!"

Parlamenterê HDP Adem Geverî, di derheqê 'Welatê hevpar' de wiha axivî: " Mebesta gotina welatê hevpar, avakirina dewleta bi destên Kurd, Tirk û kêmnetewên li Tirkiyeyê dijîn e. Lê mixabin ev gotin di raya giştî de bi armanc û mebesta avakirina li ser etnîsîteya Tirk de hatiye avakirin. Ev argûmaneke ji aliyê Kurdan ve neyê qebûlkirin e. Em nahêlin doza Kurdan a maf û azadiyê di bin siya yek welatî de bê nirxandin. Di vê mijarê de dema HDP dibêje 'Welatê hevpar', her çiqas di nav xwe de bi armanca demografîk be jî ji aliyê Kurdan ve ciyê endîşeyê ye."

Em, ji bo ku kêşeya Kurdî di çarçoveya demokrasiya sivîl de û ji aliyê parlementoyê ve bê çareser kirin têdikoşin. Geverî, wiha pê de diçe: "Proseyeke nû ne ji aliyê Erdoğan ve tê destpê kirin ne jî em li benda hêviyeke wisa ne. Heta ku kêşeya Kurdî li hêlê be elbet dê dewlet pêwistî bi guherîn û çareseriyên demokratîk bibîne."

## "Kurdan dev ji daxwazên xwe bernedaye"

Rojnameger Yaşar Aydin jî di derheqê peyamên Erdoğan û Demîrtaş de wiha axivî: "Erdoğan, terîfa neteweke ku her kesî di xwe de dihewîne kir. Lê belê bal kişan ser 'Yek Milet'î. Gotina Demîrtaş ya 'Welatê hevpar' hinek cuda ye lê ev ne tiştekî nû ye. Ji xwe tevgera Kurdî û siyasetmedarên wê balê dikşînin ser welatê hevpar. Daxwaza veqetînê nakin û vê yekê jî ji mêj ve dibêjin. Lê daxwaza Kurdan ji mêj ve ye statû ye. Axaftina bi zimanê xwe, xweserî ne be jî xurtkirina îdareyên herêmî dixwazin. Em ê bibînin da dev ji van daxwazan berdane an bernedane. Ez bawer nakim ku dev jê berdane."

Aydin, di demeke nêz de çareseriyê nabîne û wiha radigihîne: "Ev yek girêdayî polîtîkayên Erdoğan yên Rojhilatanavîn e. Heger razî bibe dê di derheqê Kurdên Rojava de biryarekê bide. Dû re jî bi wê biryarê re dê pêşeroja Kurdên Tirkiyeyê bê dayîn. Ez nafikirim ku mîna berê maseyeke proseyê jî ava bibe. Divê riyeke din bê ceribandin. Heta dawiya havînê herkes dê li Rojhilatanavîn hêza xwe biceribîne. Wisa texmîn dikim ku Tirkiye jî piştî havînê dê têkiliyên xwe ligel Kurdên Rojhilatanavîn biryara xwe bide û dê gavên resen bavêje."

Aydin, pêvajoya cara din jî nirxand û wiha got: "Ez texmîn nakim Tirkiye bikeve pevçûnan. Mebesta min ev e; Pevçûna ligel Kurdên Suriyeyê niha mimkûn nabînim. Lê belê di demeke nêz de jî diyalog jî xuya nakin. Mihatabên pêvajoya berê ne HDP bû. HDP, navbeynkar bû. Mihatap Qendîl û Îmralî bûn. Eger ligel HDP bibe jî bi van berpirsyaran re nabe. Di nav HDP de dê mihatabên cuda bên dîtin. HDP jî dê rê bide vê yekê. Dibe bibêjin bila 'Ahmet Turk û Sirri Sakik birêve bibin.' Lê belê niha ev yek ne mimkûn e."

Aydin dibêje piştî 7'ê Hezîranê, Erdoğan ligel MHP koalîsyon pêk aniye. Lê ev koalîsyona ligel MHP dê têk biçe. Îhtîmala piştî têkçûna koalîsyona ligel MHP dê Erdoğan nêzikî Kurdan bike.

Aydin di dawiya axatina xwe de wiha dibêje: "Her çiqas kongre pêk hatibin jî her kesek di bendêmayînê de ye. Armanca kongre, bi rastî jî berhevkirina fikrekî siyasî bê deklare kirin e. Lê belê ne ji kongreya AKP û ne jî ji ya HDP tu encam derneketin. Erdoğan, li geşepêdanên Rojhilatanavîn dinêre, HDP jî li Erdoğan dinêre. Dixwaze bibîne ka dê çi bike. Ji ber ku daxwaza aştî û proseyê bê kirin jî eger mixatap nîn be bê wate ye."

Karîkator ---------- Dijwar Ibrahim



# Danasîna romana Kobanî hat kirin

Nivîskar û helbestvanê Kurdê Kobaniya Rojavayê Kurdistanê Jan Dost, li Stenbolê di çalakiya ku bi sponsoriya Heftenameya Basê pêk hat de, danasîna romana 'Kobanî'yê kir û bi xwînerên xwe re hat bal hev.

Nivîskar Jan Dost di edebiyata Kurdî de xwedî cihekî taybet e. Danasîn û roja îmzeyê a Romana nû ya Jan Dostê a bi navê ' Kobanî' li Stenbolê li Hola Civînan a Cezayirê hat lidarxistin. Di çalakiya ku gelek Kurdistanî beşdar bûn de, Dost bo xwîneran pirtûka xwe îmze kir. Nivîskarê Kurd Dost di vê danasînê de axafitineke kurt pêşkêş kir û bal kişand ser romana xwe ya nû amaje bi wê yekê kir ku ew tenê karê edebîyatê dike û di vê romana xwe de jî dert û kulên Kurdan û şerê keç û xortên Kurdan ê li dijî zilmê raxistiye berçavan.Dost diyar kir ku ew Kobaniyê baş nas dike û 35 salan li wir jiya ye.

Dost ragihand ku wî xwestiye bi pênûsa xwe alîkariya Kurdan di şerê li dijî DAIŞ'ê de bike. Dost dibêje bi hişmendiyê ev romana xwe ya nû nivîsiye. Dost destnîşan dike ku bi romana xwe xwestiye him berxwedana ciaanên Kurd ya li Kobanî him jî êşên Kurdan û dîroka Kobaniyê bi tevahiyê bide zanîn.

Xwîneran eleqeyeke mezin nîşanî danasîna romana 'Kobanî'yê dan. Heta niha Jan Dost gelek berhemên wek roman, helbest, çîrok bi Kurdî û Erebî nivîsine û berhemên Jan Dost bo gelek zimanan jî hatine wergerandin.



# Radyoya Kurdî ya Rewanê bi mîlyonan Kurd hişyar kir



TÊMÛRÊ XELÎL

Di dem û dewranên ku têlêvîzyonên Kurdî li cihanê tunebûn, radyoyên Kurdî jî pir kêm bûn, dengê radyoya Rewana Ermenîstanê di karê hişyarkirina gelê Kurd de li tevhiyê Kurdistanê û cihanê roleke pir mezin lîst. Xurtbûna wê radyoyê bi wê yekê ve girdayî bû ku ew ya dewletê bû û bi biryara Moskwayê hatibû vekirin. Şansê Kurdan baş bû ku Moskwayê navenda pêşketina çand û edebiyeta Kurdî Ermenîstan hilbijart, ji ber ku Kurdên wê komarê ji hêla zimanê Kurdî, welatparêziyê, zanebûnan ve berbiçav diketin.


Ji bo xwendevan bizanibin ka miletê Kurd bi çi heyecanê û hewesê guh dida radyoya Rewanê, ezê çend fikirên serokê Înstîtûya Kurdî ya Parîsê Kendal Nezan binivîsim ku wî li Rewanê, ji serokê radyoyê Xelîlê Çaçan re gotibû. Birêz Kendal gotiye:

”Li Kurdistana Bakur kesên ku dixwestin ji xwe re radyo bikiriyana, her tenê ji bo xatirê dengê Rewanê dikirîn û wan deman dihatine dikanan, dema radyoya Rewanê dest bi weşanên xwe dikir. Eger wê radyoyê dengê Kurdên Ermenîstanê baş bikişanda, dihate wê maneyê ku ew radyoyeke baş e. Û hîç caran ew pêl nediguhistin”. Rojekê jî Kendal diçe zozanan, guhdariya radyoya Rewanê dike, paşê hewil dide pêlên radyoyê biguhêre ku bizanibe ka li cihanê çi heye, çi tune. Wê demê xwediyê malê jê dixeyîde, dibêje: -Te pêla radyoyê guhart, te radyoya min xira kir.

Radyoya Rewanê berî her tiştî bi stranên xwe navdar e. Dengê Şeroyê Biro, Efoyê Esed, Bêmalê Keko, Sûsîka Simo, Belga Qado, Memoyê Silo, Reşîdê Baso, Aramê Tîgran, Şivanê Perwar, Zadîna Şekir, Memê Xudo, Aslîka Qadir, Fatma Isa, Mehmedê Mûsa, Egîtê Têcir, Şebabê Egît, Batalîkê Şîrin, sazbend Şamilê Beko, Xelîlê Evdile, Egîtê Cimo û gelekên din bi dehan salan şabûn û bextewarî kirine her maleke Kurdan.

Ev kar bi saya serê aqilmendiya serokê radyoyê û xebatkarên wê pêk hatiye. Texmîn bikin, ku dengbêjên Kurdan ne profesyonel bûn, sazbend jî amator bûn, lê wek dibêjin, dayîna Xwedê di ser wan da zêde dibû û ew dibûn profesyonelên rasteqîn. Zehmetiya qeydkirina stranan ew bû ku dengbêj ji gundekî bû, sazbend, ango defçî, zirneçî û yên din ji gundên din bûn, gerek e ji bo qeydkirina her kilamekê wan berevî ser hev bikin, bînin Rewanê, çend rojan bi hev re ceribandinan bikin, heta stranekê qeyd bikin. Û bi vî awahî, 1700 stran hatiye qeydkirin. Bifikirin ku dengbêjek li serê çiyê ye, xweş distrê, wî tînin Rewanê bona li stûdyoyê dengê wî qeyd bikin. Dengbêj jî cara pêşin e tê Rewanê, wî dikin odeyekê, rêjîsor û operator li dorê diçin-tên û dibêjin dest pê bike bistre. Dengbêjên me jî xwe şaş dikirin, xûdan li ser wan re davêt, heta stranên wî qeyd dikirin, roj û hefte derbas dibûn.

Zehmetî ewqas pir bûn ku heta henek jî jê derdiketin. Dengbêjekî pir navdar hebû, nedihat radyoyê bona dengê wî bê qeydkirin. Sebebê nehatina wî jî ev bû: ”Heyran, ez xirab bistrêm, guhdar wê bêjin kurê kerê nikare bistrê; ez baş bistrêm, milet wê bêje ev kurê kerê çi xweş distirê…”. Lê dawî baş bû, ew dane qanekirin hat û stra.



Radyoya Kurdî ya Rewanê 16'ê sibata 1955'an wek test vebû. Wê demê Casimê Celîl rêvebirê radyoya Kurdî bû, diya min Eznîva Reşîd jî bêjer bû. Ji hefteyekî çar roj bûn, ew jî bi 15 deqeyan. Piştî du salan, sala 1957'an biryar kirin wê radyoyê ji testê derxin û bikin radyoya dewletê.

Her stranek xwedî dîrokekê ye. Ez nimûneya stranekê bidim.

Berî 40 salan stranek li ser Barzaniyê mezin hat qeydkirin. Navê stranê ”Mêrê Mêrxas” bû. Pêşî xwastin Aramê Tîgran wê stranê bistirê. Aram got ez nastrêm, ji ber ku wan deman li Ermenîstanê dima û ditirsiya ku Ermenî wê jê re bêjin tu Ermenî yî lê pesinê serokê Kurdan didî. Hevalan ew stran dane min ku ez bistirêm. Min got ezê bistrêm. Lê serokê radyoyê Xelîlê Çaçan bavê min bû û gote hevalan: -Ez û xanima xwe li radyoyê kar dikin, nabe ku kurê min bistrê, ji ber ku wê bêjin ew û xanima xwe kar dikin, ne bes e, kurê xwe jî tînin. Heval çûn ba serokê radyoya Ermenîstanê ser bavê min şikyat kirin ku çima nahêle ez bistrêm. Serok ji bavê min re got ku sûcê Têmûr nîne ku kurê te ye. Û min ew kilam stra. Radyoya Rewanê di bin kontrola Moskwayê de bû û ji wir dihate birêvebirin. Carinan ji bavê min re têlêfon dikirin digotin: -Kilama ser Barzanî mehekê nedin. Paşê têlêfon dikirin digotin ku wê kilamê her ro bidin. Me ji wir texmîn dikir ku pêwendiyên Sovyetê bi Îraqê re hey baş dibin, hey xirab dibin.

**Dîroka bingehdanîna wê radyoyê ji destpêkê heta îro wiha ye:**

Radyoya Kurdî ya Rewanê 16'ê sibata 1955'an wek test vebû. Wê demê Casimê Celîl rêvebirê radyoya Kurdî bû, diya min Eznîva Reşîd jî bêjer bû. Ji hefteyekî çar roj bûn, ew jî bi 15 deqeyan. Piştî du salan, sala 1957'an biryar kirin wê radyoyê ji testê derxin û bikin radyoya dewletê. Komîsyona taybet ya ji 12 zaneyên Kurd û Ermeniyan, nûnerê radyoya Moskowayê dema karê Casimê Celîl yê di nava du salan de kiriye nihêrin, dîtin ku hema bêje hîç stranek nedaye qeydkirin. Serederî li karê xwe nake, dengbêjên ku hatine stranan bêjin qebûl nekiriye. Bi yekdengî biryar dikin wî ji kar derxin û Xelîlê Çaçan Mûradov bikin serokê radyoyê. Dema Xelîlê Çaçan bû serok hîvî ji komîsyonê kir ku Casimê Celîl di radyoyê de bimîne ango ber destê wî kar bike, bona bê kar nemîne. Wisa jî bû, Xelîl beşa stranan da wî. Xelîlê Çaçan bû serok û heta sala 1981'ê wek serok ma (24 salan) û Casimê Celîl jî li ber destê serokê radyoyê 6 salan kar kir. Ango Casimê Celîl du salan serokê radyoya testê lê Xelîlê Çaçan 24 salan serok bû û dema radyoyê jî her ro bû û 90 deqe bû.

Ezê sureke wê radyoyê diyar bikim. Dema Mustefa Barzaniyê serokê hemû Kurdan yê hemû deman sala 1957'an ji Moskwayê hat Ermenîstanê û bû mêvanê radyoya Kurdî, ji serokê wê Xelîlê Çaçan re got: "Rola radyoya Kurdî ya Yêrêvanê di karê hişyarkirina gelê Kurdistanê de pir e. Em çi alîkarî dikarin bidin we?" Xelîlê Çaçan nameyek nivîsî, da Barzaniyê mezin ku bide serokê Sovyet Nîkîta Xrûşçov û jê hêvî bike wextê radyoyê zêde bikin.

**Piştî 3 mehan wextê radyoyê bi du caran ve zêde bû.**

Dewlemendiyeke din a radyoya Rewanê herwiha pîês-şanoyên wê ne. Yên wek ”Elenewêrek”, ”Xecê û Sîabend”, ”Memê û Zînê”, ”Bê qelen”, ”Hisret”, ”Meriv gerek e pêşekê bizanibe”, ”Gîkor”, ”Memê û Eyşê”, ”Zembîlfiroş” û yên din. Bidine ber çavan ku ew pîês piştî kar dihatin amadekirin. Qîmetê wan pîêsan herwiha ew e jî, ku serokê radyoya Ermenîstanê M. Ayvazyan rojekê got: ”Pîêsa nivîskarê Ermeniyan Hraçya Koçar ya bi navê ”Hizret” Ermeniyan jî çêkiriye, Kurdan jî. Lê ya Kurdan ji ya Ermeniyan baştir derketiye, ew jî wê demê gava hemû artîstên Ermeniyan profesyonel in, lê yên Kurdan ne profesyonel in.

Ev hemû kar bi saya serê serokê radyoyê Xelîlê Çaçan Mûradov, cîgirê wî Qaçaxê Mirad, serwêrên parê Fêrîkê Ûsiv, Şikoyê Hesen, Mirazê Evdo, Mikayêlê Reşîd, Sîma Semend, Emerîkê Serdar, Keremê Seyad, Eznîva Reşîd, Sêvaza Evdo, Bariyê Mehmûd, Hamoyê Rizgo, Wezîrê Eşo û yên mayîn pêk hatiye. Bextê min lê xist min jî ji sala 1981'ê heta sala 1984'an di wê radyoyê de wek berpirsyar kar kir.

Lê çi mixabin, ku hinek kes hewil didin vî karê bêhempa biçûk bixin, an jî bi navê neferên malbeta xwe ve girêdin. Em gerek e nehêlin derew bikevin nava dîrokê, rojnameyan, malperan û pirtûkan!

## “Divê Nûbihar“ vê şaşiya xwe rast bike”

Di hejmara 122'an a kovara “Nûbihar“ de (zivistana sala 2013'an) gotara Salihê Kevirbirî çap bûye û li wir tê gotin: “Cemîla Celîl tevî rehmetiyê bavê xwe Casimê Celîl 1700 stran, kilam û awazên Kurdî berhev kirine“. Ya herî ecêb ew e ku Salihê Kevirbirî rind zane ku ne wisan e, ji ber ku Cemîle jî, bavê wê jî çend salan tenê li radyoya Rewanê li ber destê Xelîlê Çaçan kar kirine (wek Kurd dibêjin, wey li wê karkirinê) û biryara dengnivîsar, qeydkirina kilaman, hilbijartina dengbêj û sazbendan her tenê di dest serok de bûye û tu eleqê Cemîlê û bavê wê bi wan karan ve tunebûye ango tu keda wan di berhevkirina wan stranan de tune, tu stran jî berhev nekirine.

Neferên malbata Casimê Celîl gotarên ha gelek nivisîne û çap kirine, lê rastî tam tiştekî din e. Ez hêvîdar im ku kovara “Nûbihar“ jî vê şaşiya xwe rast bike.

Nimûneyeke din: Rojnamevan Mehmet Aktaş ji bo têlêvîzyona Med-TV wextekê bi Karapêtê Xaço re hevpeyvîn kiribû. Karapêt di wê roportajê de bi zar-zimanê xwe ji M. Aktaş re dibêje ku ew sala 1956'an hatiye radyoya Rewanê stranan bêje, Casimê Celîl jê re gotiye: - em nikarin stranên te qeyd bikin, ji ber ku tu di stranên xwe de behsa şêx, axa û began, kuştin û heyfhildanê dikî (eva îzbat e û her kes dikare wê roportaja M. Aktaş bibîne û guhdar bike). Karapêt vedigere mala xwe û piştî salekê serokê radyoyê Xelîlê Çaçan behs ji Karapêtê Xaço re dişîne, wî careke din tîne radyoyê û hemû stranên wî qeyd dike.

Ango, dîroka radyoyê di rastiyê de ji sala 1957'an dest pê dibe, dema Xelîlê Çaçan bû serok û hemû miqam, stran û pîêsên radyoyê di dema wî de hatine qeydkirin.

Piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê, wextê radyoyê ji 90 deqeyî daket 30 deqeyan, satelita ezmanî jî nemaye ku Kurdên Kurdistanê guh bidin wê radyoyê. Jimara xebatkaran ji 12 kesan daketiye 2 kesan. Mala Keremê Seyad, qîza wî û kurê wî Tîtalê Kerem ava ku ev demeke dirêj e wê radyoyê bi rê ve dibin, nahêlin ew bê girtin. Lê rastiyek din jî heye ku ew radyo bi nav heye lê di rastiyê de tune. Ango, fermana girtina wê nehatiye dayîn, weke ku heye.

---

HOŞENG OSÊ

## PKK û Lêborîn



Lêborîn helwesteke şaristanî û rawiştiye. Eger mirov şaşîtî, kêmasî yan jî tawanan kiribe, ne tiştekî xerab û pîs e, mirov lêborîna xwe bixwaze. Lêborîn, hest û helwesta mirov bilind dike û tu carî kesayetiya mirov nizm û kêm nake. Dewlet yan sazî yan kesayet… hwd, dema li xwe vedigerin û li şaşîtiyê xwe mikur tên, lêborîna xwe dixwazin. Amerîka lêborîna xwe ji Japonya û ji Vietanmê xwest. Japoniya lêborîna xwe ji Çînê xwest. Almanya lêborîna xwe ji Europa û ji Cihûyan xwest… hwd.

Di nava Kurdan de, li gorî şopandin û agahiyên min û dibe ku ez şaş bim jî, tenê serokê herêma Kurdistanê Mesud Barzanî, di derbarê şerên navxweyî (birakujî) de ji gelê Kurd û qurbaniyên van şeran, lêborîna xwe xwest û soz da ku careke din, dibin çi şert, merc û rewşê de be, dê nehêle dîsa ew rûpelên reş xwe dubare bikin.

Bê guman, dewlet û rêjîma Tirkiyeyê xwedî dîrokeke reş, bixwîn û hovane a sedên salan ne û rast e Komara Tirkiye ev kevneşopî di salên 1925 – 1938an û heta niha berdewam dike, lê ev dewlet li ser navê serokê hikûmetê wê çaxê û serokê dewletê niha Recep Tayyip Erdoğan di sala 2011an de lêborîna xwe derbarê komkujiya Dersimê de xwest.

Mebesta min ji vê gotinê ev e; rast e dewleta Tirkiyê tawanên şer û “Jenosîde” li dijî Kurd, Ermen û Suriyaniyan pêk aniye, lê PKKê jî gelek tawanên şer pêk anîne û bûye sedema kuştina kesên bê guneh û rûxandina mal û gundan.

Gelek qadroyên ku ji PKKê veqetiyane baş dizanin bê çawa bi sedan ji keç û xortên Kurdan hatine kuştin “tesfiye kirin”. Ev qurbaniyên ku ji sedan bêhtirin, her yek ji wan 3ê caran hatine kuştin; 1- Dema PKKê ew weke “xayîn” bi nav kirin û ew “dadgeh kirin”. 2- Dema fermana kuştinê li ser wan pêk anî. 3- Dema PKK çû cem malbatên van qurbaniyan û ji wan re bi dizî got: “Em şaş bûn, me law/keçên we kuştin. Ew ne xayîn bûn. Em wan şehîd bidin nas kirin û divê hûn devên xwe venekin”. Her wisa, medya û ragihandina PKKê derbarê her yek ji van qurbaniyên han de, çîroka nûçeyeke derew hûnand û belav dikir; “ev şehîdê/a qehreman di şerekî dijwar ê li hemberî artêşa Tirk de jiyana xwe ji dest da”. Ji xwe ev kuştina sêyemîn ji her dû kuştinên din tahl û dijwartir bû, ji ber ku vir û dereweke mezin li gelê Kurd û malbata kesê “qurbanî-kuştî-şehîd” dikirin.

Di pêvajoya dîroka wê de (1978-2017) tu carî çênebûye ku PKKê bi şêweyekî fermî eşekere û zelal ji gelê Kurd, yan ji partiyek, yan ji malbatek, yan ji êl û eşîrekê, yan ji kesekî Kurd…, lêborîna xwe xwestiye.

Öcalan di hin pirtûkên xwe de behsa “cînayetên” PKKê kiriye, lê Öcalan xwe ji wan dişo û xwe berpirsê wan tawan “cînayetan” nabîne.

Birayê Abdullah Öcalan, Osman Öcalan, derbarê tawanên “kuştin-tesfiye” ku di hundirê PKKê de çêbûne, dibêje: Hayê Apo tenê ji %10 heye û ji %90 hayê wî ji wan nîne”. Lê Abdullah Öcalan vê jî nabêje û tim tawanên “kuştin-tesfiye” dixe stûyê PKKê de. Eger em Öcalan weke “bêguneh” û “firişte” yan “pêxember” jî bibînin, sucê wî ji %100, ji ber ku ew serokê PKKê ye, dêmek berpirsiyariya wî di van kuştina de heye. Ango, Öcalan di pirtûkên xwe de li xwe û li PKKê mikur tê ku partiya wî ewqas “cînayet-kuştin-tesfiye” kiriye, lê lêborîna xwe ne ji qurbaniyên PKKê ne jî gelê Kurd dixwaze.

Ji 1978an û heta niha, PKKê tenê du caran lêborîn xwestiye, ew jî ne ji gelê Kurd xwestiye. A yekê; dema Abdullah Öcalan, di sala 1999an de li pêşberî dadgehê, malbatên leşkerên Tirk û pêşberî medya Tirk û ya cîhanî lêborîna xwe ji dayikên leşkerên Tirk xwest, lê dayikên şervanên Kurd ji bîr kirin. Ango, gerek dayikên Cemîle Merkît, Yildirım Merkît, Çetîn Güngür, Enwer Ata, Şahîn Dönmez, Mehmed Şener, Orhan Aydin… û bi hazaran ku di şer, yan di zindana de hatine kuştin, yan bi destên PKKê hatine kuştin, gerek malbatên wan jî beşdarî darizandina Öcalan bibûna da ku serokê PKKê lêborîna xwe ji wan jî bixwesta.

Cara duyemîn PKKê lêborîna xwe xwest, ew jî ne ji gelê Kurd bû, lê ji Almanya û welatên Europa bû. Ev lêborîn, derbarê karên tund û tûjiyê ku PKKê di navbera 1993-1999an li Almanya û Europa kiribûn. Ev lêborîn jî, di dema ku Cemîl Bayik bû serokê PKKê bû. Ango, qaşo Bayik xwest xwîna xwe bi Almanya û Europa şêrîn bike, ev lêborînê xwest.

Di encamê de, PKK hînbûye tenê ji Tirk û biyaniyan lêborînan bixwaze, lê çi bi serê Kurdan bike, xem nake!

# Pişta Îranê li navçeyê vala dibe!

ESKENDER CEIFERÎ

Piştî hatina Komara Îslamî û têkçûna rejîma Pehlewî, pêwendiyên di navbera Îran û Amerîkayê û Îran û Erebistanê de jî xirab bûne. Sala 1979'an piştî ku Xumeynî Komara Îslamî ava kir, saziyeke bi navê Xwendekarên Rêbaza Xumeynî êrîşî ser sefareta Amerîkayê a li Tehranê kir. Sala 1981'an Îran û Amerîkayê li ser berdana 66 dîplomatên ku Îranê girtibûn, li hev kirin. Lê ji wê demê ve hemû pêwendiyên xwe yên dîplomasiyê, qut kirine.

Sala 2015'an Amerîkayê li banka Fransî ya Parîbas dest daniye ser pereyên Îranê û ew pereyên ku nêzîkî çar milyon doleran bû, dane wan dîplomatên ku Îranê 444 rojan ew girtibûn. Îranê hewl da wan pereyan vegerîne lê nikarî.

Îran her tim, Amerîka û Erebistanê weke du hêzên mezin binav dike ku bi alîkariya Îsraîlê, dijatiya Komara Îslamî dikin. Ev çend sal in ku pêwendiyên di navbera Îran û Erebistanê de jî bi giştî qut bûne. Aloziya di navbera wan de jî piştî vê hat ku hejmareke zêde ji heciyên Îranî li Erebistanê mirin. Pişt re hêzên nêzîkî Sipaya Pasdaran ku xwe weke xweser binav dikirin, êrîşî ser balyozxaneya Erebistanê ya li Tehranê kirin.

Dijberên Komara Îslamî dibêjin sîstema wî welatî nikare mafên netewên cuda bide wan. Ji ber wê jî her aliyek siyasî, bi nerînên xwe nêzîkî yek ji wan dewletan e ku Îran dijatiya wan dike û her tim slogana jinavbirina wan hildide.

Piştî ku careke din Hesen Rûhanî bû serokkomar, ti yek ji Îsraîl, Erebistan û Amerîkayê pîrozbahî li wî nekirin. Wan ragihand ku ew rêzê



ji dengê xelkê re digirin lê divê Îran zulmê bi dawî bîne û piştevaniya terorê jî neke.

Neyarên Komara Îslamî jî dibêjin ku Rûhanî qet nikare mafê neteweyên ne Fars li wî welatî bide. Ew dibêjin sedem ev e ku di yasaya bingehîn de tiştek wisa tine ye. Gotinên bi vî rengî li navxwe jî derketin. Celal Celalîzade parlamenterê berê yê Sine got ku Hesen Rûhanî sozên ku dane Kurdan bicî nekirine û tevî ku 73 ji sedî ji Kurdên Rojhilatê Kurdistanê dengên xwe dane wî, lê ew sozên xwe bicî nayne û divê di hikûmeta xwe de pile û paye bide Kurdan û çareyekê ji vêbêkariyê re bibîne ku li Kurdistanê heye. Lê Komara Îslamî, tev wan rexnegiran bi dewletên biyanî ve girêdide.

Heman roja ku Hesen Rûhanî cara duyemîn bû serokkomar û Mihemedcewad Zerîf wezîrê Derve, bang li dewletên Ereb yên derdorê kir ku ji bo pêwendiyên baştir tevbigerin, Îran rastî mezintirîn civîna ji bo goşegirkirina wê sîstemê hat. Serkirdeyên hemû dewletên misilman ji xeynî Îran û Sûriyê, beşdarî civînekê bûn ku Melîk Sulêman şayê Erebistanê û Donald Tramp serokkomarê Amerîkayê li Riyazê ew civîn birêve dibirin. Tê de metirsiya Îranê, ji ya Dewleta Îslamî DAÎŞ'ê mezintir hate binavkirin û hate ragihandin ku Îran, piştevanê terorê ye. Tramp û Melîk Sulêman li cem 40 serkirdeyên dewletên îslamî gotin ku Îran ji 1979'an ve bûye gef li ser navçeyê. Lê dengekî zêde lidij, ji wan 40 serkirdeyan derneket.

Hin berpirsên Îranî, carna dibêjin tevgerên partiyên Kurdî weke Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û Komeleya Şoreşgêrên Zehmetkêşên Kurdistana Îranê bi hemahengî ligel Erebistana Seûdî re ne. Lê ew partî, tim vê îdiayê red dikin. Di rojên derbasbûyî de jî Ebolfezl Hesen Bêgî endamê komîsyona siyaseta derve ya parlamentoya Îranê gef li neyarên sîstema Îranê yên li Başûrê Kurdistanê xwarin û got emê ji bo jinavbirina wan 40 kîlometran derbasî kûrahiya Îraqê bibin ku mebesta wî Herêma Kurdistanê ye. Ew gefê li rêxistinên Belûçan jî dixwe û dibêje em rê nadin ji Efxanistan û Pakistanê derbasî nav Belûçistana Îranê bibin û endamên Sipaya Pasdaran bikujin. Ebolfezl Hesen Bêgî teqez dike ku Erebistan û Amerîka li pişta Ceyşul Edla Belûçan, PDKÎ û Komele ne.

Ew îdiayên wî berpirsê Îranî piştî vê hatin ku Donald Tramp di civîna xwe de li Rizayê bi amadebûna serkirdeyên ji Îraq, Efxanistan, Pakistan û 37 dewletên din got ku divê hemû alî li navçeya Rojhilata Navîn, ji bo goşegirkirina Îranê tevbigerin. Wî teqez jî kir ku Komara Îslamî, terorîstan perwerde dike û ev dehan sal in ku agirê kîn û şer li navçeyê xweş dike û dixwaze Îsraîlê jinav bibe. Wî got ku dewsa destên Îranê li Yemen, Sûriye û Îraqê xuya ne û ev jî li ser berjewendiya wan gef in.

Çavdêr jî dibêjin ku hatina Tramp, Erebistan û Amerîkayê zêdetirî serdema Barak Obama li hev nêzîk dike û Tramp wê hevpeymaniya Erebistanê li dijî Îranê mezintir bike ku ev nêzîkî du salan e li navçeya Kendavê pêk hatiye.

# Şûnwarên dîrokî yên Îlamê ber bi jinavçûnê ve diçin

Li parêzgeha Îlamê, nêzîkî hezar û 500 şûnwarên dîrokî û kevnar hene. Îlam ji ber vê jî weke bûka Zagrosê hatiye binavkirin.

Ew hemû şûnwarên dîrokî ku beşeke wan pêşîneya Kurdan nîşan didin, heya niha nikarîne bibin sedema pêşketina torîzmê li wê parêzgehê. Sedemek jî girîngînedana aliyê hikûmî bi Rojhilatê Kurdistanê ye û sedema din jî nebûna planeke baş e ji bo parastina şûnwarên dîrokî.

Gelek ji wan şûnwaran rastî êrîşa dizan tên. Dîroka Kurdan bi pereyekî kêm tê firotin. Talankirina wê dîrokê, ne tenê ji aliyê dizan ve ye lê belê carna jî aliyê hikûmî, wan kelûpelên kevnar dibe û bêyî ku ti lêkolînekê li ser wan bike, difiroşe.

Gelek ji wan şûnwaran jî, ji ber nebûna alîkariyên Saziya Mîratên Çandî rastî herifînê tên. Lehî û barîna zêde ya baranê jî hin ji wan rastî xirabûnê tîne. Lê saziya navborî ragihandiye ku bûdceya pêwîst ji bo nûjenkirin yan jî parastina wan cihên dîrokî nehatiye dayîn. Herwisa beşek ji bûdceyên ku ji wê saziyê re têne mezaxtin, ew sazî ji bo geşepêdana çanda îslamî terxan dike û karê wan bi parastina wan şûnwaran neketiye ku behsa dîroka Madan dikin.

Ehmed Şohanî parlamenterê berê yê Îlamê dibêje hewlên ciddî ji bo parastina dîroka şaristaniya Îlamê nayên dîtin û pêwîst e dewlet ji bo nehêlana vê xemsariyê, tevbigere.

Parêzgeha Îlamê ku bi dîroka xwe ya şaristaniyê bi 10 hezar salan, 1500 şûnwar ji Kurdan re hêlane, her sal çendek ji wan şûnwaran ji dest dide.


Kela Hizaranî li Abdananê, yek ji wan cihên dîrokî ye ku dîroka wê vedigere ji bo serdema Sasaniyan. Lê niha dîwarên wê ji ber nûjennekirinê, rastî herifînê tên.



Kela Sikesan jî, ku dîroka wê serdema Madan e, beşeke zêde ji odeyên wê hilweşiya ne û pêwîstiya wê jî bi parastinê heye.

Çend sal beriya niha hin nivîskarên Îlamî, di nameyekê de ji Saziya Mîratên Çandî xwastin da ku Poşt Qele li 5 kîlometriya bajarê Abdananê nûjen bikin ku beşeke dîwarên wê ji ber rabûna lehiyê, xira bûne. Lê tevî ku soza nûjenkirinê hate dayîn, dîsa jî ew nehatiye parastin.

Ebdulmakil Şenbezade berpirsê ragihandina wê saziyê dibêje bûdceya herî zêde, ji bo parastina qebrên neviyên îmamên şîe li wir têne xerckirin. Destûra ku ji wan re hatite dayîn ev e ku erka wan piştî parastina mezargehên neviyên îmaman pişt re parastina şûnwarên dîrokî ye.



# Heftiyek mafên mirovan li Rojhilatê Kurdistanê

Ismet Giramî berendamê Kurd yê civata bajarê Urmiyê ku namzediya wî çend xulekan beriya hilbijartinên encumenên gund û bajarên Îranê hatibû redkirin, piştî hilbijartinan hat girtin. Lê tevî vê jî malbata wî newêre behsa girtina wî bike. Ismet Giramî çûbû cem şaredarê Urmiyê û jê xwastibû sedema redkirina namzediya wî jê re bêje. Piştî wê serdana Ismet Giramî ji bo ba şaredarê Urmiyê, ew ji aliyê hêzên îstixbaratê ve hat girtin.

Di heftiya derbasbûyî de li çend navçeyên sînorî ji ber teqîna mayînan çend welatiyên Kurd jiyana xwe ji dest dan yan jî birîndar bûn. Ji ber teqîna mayînê du welatiyên Kurd li bajarê Mêhranê li parêzgeha Îlamê bi navên Umran Xelîlî yê 31 salî û Behimne Êsfende birîndar bûn. Li navçeya Serqela ya Salasa Bawecanî li parêzgeha Kirmaşanê jî ji ber teqîna mayînê, welatiyekî bi navê Adil Welîzade jiyana xwe ji dest da û kesekî din jî birîndar bû. Li zozanên derdora Pîranşarê jî teqîna mayînê lingê welatiyekî Kurd bi navê Ebdula Nobext ku temenê wî 37 salî bû, qut kir.

Piştî belavbûna nûçeya egera darvekirina Hêmin Mistefayî girtiyê siyasî yê Kurd li girtîgeha navendî ya Sine, çalakvan bi xwepêşandanan li ber deriyê girtîgehê bûne sedem ku darvekirina wî heya demeke nediyar bê paşxistin. Dibe ku biryara darvekirina wî di demeke nêzîk de were bicîkirin. Ew, tometbar e ku bi sê kesên din re endamekî Sipaya Pasdaran li Merîwanê kuştine. Hêmin Mistefayî bi tometa şerê li dijî Xwedê bi darvekirinê hatiye cezakirin. Endamên partiyên Kurdî ji aliyê Komara Îslamî ve bi vê tometê têne cezakirin.

Girtiyekî siyasî yê Rojavayê Kurdistanê bi navê Kemal Hesen Remezan bi tometa hewldan li dijî ewlehiya Îranê û şerê li dijî Xwedê di riya endamtiya xwe di partiyên Kurdî de ji aliyê dadweriya Îranê ve bi îdamê hat mehkûmkirin. Kemal Hesen Remezan ku niha li girtîgeha Urmiyê ye, havîna 2014'an li gundekî girêdayî wî bajarî ji aliyê pasdaran ve hatibû girtin.

Çalakvana Kurd Esma Pûrselîm ji aliyê saziyên ewlehî yên Îranê ve bi tometa endametî di partiyên Kurdî de rastî lêpirsînê tê. Ew keça Kurd, tometbar e ku sala 2015'an endama partiyeke Kurdî bûye û êrîş kiriye ser hin endamên Sipaya Pasdaran.

Tenê sê rojan piştî ku Hesen Rûhanî ji bo cara duyemîn bû serokkomarê Îranê, li girtîgeha Dêzilawa li Kirmaşanê welatiyekî Kurd bi navê Mêhrdad Eskerî hate darvekirin. Tometa ku li wî welatiyê 33 salî, kirrîn û firotina madeyên hişber bû. Mêhrdad Eskerî nêzîkî pênc salan girtîbû.

Fayiq Çîre piştî du sal û rojekê ji girtîgeha Me-



habadê serbest hate berdan. Ew bi tometa xapandina raya giştî di riya xwepêşandanên li dijî Komara Îslamî de bi du sal û rojek girtinê hatibû cezakirin.

Li bajarê Nexede welatiyekî Kurd bi navê Mîlad Deştî ji aliyê hêzên îstixbarata Sipaya Pasdaran ve hate girtin. Tometa wî alîkariya endamên partiyên Kurdî bû. Heya niha nayê zanîn ew li ku derê tê ragirtin.

Li Sine, Sipaya Pasdaran dest daniye ser mal û milkên girtiyekî Kurd bi navê Têymûr Xalidiyan. Ew welatiyê Kurd, di destpêka Newroza 2017'an de ji ber sedemên siyasî hate girtin. Piştî ku ji bo wergirtina erdên ku ji bavê wî jê re mabûn, serdana saziya dadweriyê kir, jê re hate ragihandin ku Sipaya Pasdaran dest daniye ser wî erdî. Têymûr Xalidiyan salek beriya niha jî piştî encamdana xwepêşandanekê li ber ofîsa Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî hatibû girtin û pişt re bi danîna kefaletê hatibû berdan. Lê îsal, heya niha Sipaya Pasdaran rê nedaye ew bi danîna kefaletê jî bê azadkirin.

Daxwaza pêdeçûnê ya 11 welatiyên Kurd li Şinoyê bê bersiv maye ku bi tometa endametî di partiyên Kurdî de hatibûne cezakirin. Beriya çend mehan Hêdayet Ebdullapûr bi darvekirinê, Hasil Ezîzî bi 25 salan hepsê, Mihemedzahir Feramerzî bi 20 salan, Yeiqûb Baîkram bi 15 salan, Fetah Pûrehmed bi 22 salan, Celal Mehmûdî bi 22 salan Luqman Emînî bi 16 salan, Celal Mesrûrî bi 15 salan, Kemal Mesrûrî bi 11 salan û Sidîq Baîkram bi 10 salan girtinê hatine mehkûmkirin. Ev 11 kes, piştî derketina şerê di navbera pêşmergeyên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi endamên Sipaya Pasdaran re li gundê Qereseqelê yê Şinoyê hatin girtin. Salekê beriya ew şer derket û têde bi dehan endamên Sipayê hatin kuştin û hin pêşmerge şehîd bûn.

## Seyadê Şameyê Kekê:

# "Qulingê birîndar yê Kurdistanê"



DARA PORXELEK


**JIYANEKE** sirgûnî, îşkencekirî û mayîna bi salan di zindanan de... Seyadê Şamê ji aliyê malbata xwe ve wek mirî dihat zanîn. Dema dengê Seyad di Radyoya Rewanê de olan dide bawerî bi jiyanek ji nû ve vejînandî tê kirin.

Malbata Kekê, girêdayî Eşîra Celaliyan e. Eşîr li navçeya Agiriya Bazidê dimîne. Nuxûriyê bavê xwe ye Seyad. Di heman demê de xwebexşekî doza Kurdistanê ye jî. Dewlet malbata Kekê di sala 1944'an de sirgûnî Yozgatê ji wir jî ber bi Alaca'ya Çorimê ve dike. Dema li sirgûnê bû dozgeriya Erziromê ji Seyad re nameyekê dişîne û dibêje: "Dê doza te ji nû ve bê dîtin, divê tu werî Erziromê." Her çiqas bavê Seyad dibêje, "Meke kurê min, tesmîlê destê leşkerê Romê nebe" jî Seyad dibêje: "Bavo heta niha min tenê êş û elem daye we, bisekine ez biçim û vê sirgûniyê bidawî binim da ku hûn vegerin Kurdistanê." Bavê Seyad li ser van gotinan misaade dide Seyad û Seyad berê xwe dide Erziroma şewitî.

Dema Seyad diçe Erziromê, bêyî dozgeriyê wî desteser dikin û dibin zindanê. 3 salan di zindanê de dimîne. Rojekê leşkerek, di nav nanê somin de bireka hesinbiriyê digihîne Seyad û Seyad û 2 hevalên xwe ji zindanê fîrar dikin. 26 rojan di zivistana Serhedê de bi peya dimeşin heta xwe digihînin hidûdê Îranê. Piştî derbasî hidûdê Îranê dibin leşkerê Sowyetê wan bi sûcdariya 'Sîxûriya Tirkiyeyê' desteser dike û dibe Tîflîsa Gurcistanê. Ji wir jî wan dibin kampa êxsîriyê a Sibîryayê. 9 salan di kampa êxsîriyê a Sibîryayê wek êxsîr dimîne Seyad. Heta sala 1953'an, di 5'ê Adarê de Serokê Sowyetê Stalîn dimire. Sowyet biryara valakirina kampên êxsîra dide û Seyad jî ji kampê derdikeve. Tenê gavek ji azadiyê dûr dimîne Seyad. Vê carê dilê feleka xayîn lê şewitî bû û ji Seyad re keniya bû.

**Piştî 50 salî vegera Kurdistanê**

Seyad piştî êxsîriyê diçe bajarê Sowyetê Kubanê û li wir dijî. Rojekê diçe Rewanê da ku heybeta Çiyayê Agirî û berfa Bazidê bibîne. Bi israra hevalekî xwe qanî dibe di Radyoya Rewanê de stranan dibêje. Dema di Radyoya Rewanê de strana 'Apo' dibêje, hemû Kurdistan bi dengê Seyad yê dilbikul re li dora Radyoyan dicive. Strana 'Apo' dibe dengê xerîbî û tenêtiya gelê Kurd. Qulingê brîndar bi wî dengê xwe yê efsûnî strana 'Esmer Eman Eman' distire û hevalên wî yên xortaniyê dengê wî dinasin. Ciwan jî bi vî dengî dizanin. Dema vî dengê Kurdistanî dibihîsin ber bi malbata Seyad ve baz didin û mizgîniya saxiya Seyad didin malbatê. Malbata Seyad piştî 49 salan dengê Seyad dibihîse. Her kesek bawerî bi jiyana ji nû ve vejinandî tîne. Mixabin Seyad wê demê li Tirkiyeyê di bin qedexê de ye nikare were Bazida xwe û ligel malbata xwe hesreta xwe bidawî bîne. Ev hesreta nîv sedsalî di sala 1991'an de li mala Seyadê Şameyê Kekê û li welatê Seyad li Bazidê bi dawî tê. Seyad di ser Hopayê de derbasî Tirkiyeyê dibe û malbata Seyad pêşwazî lê dike û wî dibe Bazidê. Ew Bazide ku di dilê Seyad de cihê evîndarî û xweşhaliya takekesayetiyê ye. Mixabin hesreta Seyad a Kurdistanê di nîvî de dimîne û dema li Tirkiyeyê mayînê bidawî dibe. Seyad vedigere Rewanê û ji welat û malbata xwe cardin dûr dikeve. Di sala 1992'an de jî koça dawî dike ev rewşenbîr û dengbêjê Kurdistanê.




Birayê Seyadê Şamê Mahmûd Çamlibel: Seyad, neynika civaka Kurd e. Wekî ku Tirkan jî gotiye tenê "cudahiyên taybet" qedera Seyad, jiyana tevahiya Kurdan e.




### "Em yekîtiya Kurdan dixwazin"

Birayê Seyadê Şamê, Mahmûd Çamlibel ji Heftenameya Basê axivî û wiha pê de çû: "Seyad nuxûriyê bavê min e. Du jinên bavê me hebûn. Em 12 zarok in. Seyad yê herî mezin e, ez jî yê herî biçuk im. Birayê Seyadê Şamê Mahmûd Çamlibel: Seyad, neynika civaka Kurd e. Wekî ku Tirkan jî gotiye tenê "cudahiyên taybet" qedera Seyad, jiyana tevahiya Kurdan e. Em wek malbata Kekê daxwaza yekîtiya Kurdan dikin."

### Keremo: Digel hemû tengezariyan jî bextewariya jiyanê jê kêm ne bûye

"Qulingê Brîndar" belgefilma çîroka dengê efsûnî yê Seyadê Şamê ye ku ji aliyê Derhêner Kerem Tekoğlu ve hatiye çêkirin. Derhênerê vê belgefilmê Kerem Tekoğlu ye û senaryoya wê jî ji pirtûka Veysel Çamlibelê birayê Seyadê Şamê hatiye amade kirin. Derhênerê belgefilmê Kerem Tekoğlu ji Heftenameya Basê re axivî û wiha got: "Ev salek e em bi vê bernameyê re mijûl in. Di salekê de me bi awayekî serkeftî ev belgefilm anî pêşberî temaşevenan. Keremo, jiyana Seyadê Şamê çîroka rasteqîn a Kurdistanê dide ber çavên me. Wek jiyana Kurdan her çiqas êş û elem hebin jî di jiyana Seyad de kêf û şahî jî cih digire.



### "Ne ev serê min î bêaqil..."

Seyad dema li kampa êxsîra ye rojekê serê xwe datîne ser betona hişk û piyê xwe jî datîne ser balgîva nerm û xweş. Sofiyek berê xwe didê û li ecêba wî diçe. Bangî Seyad dike û dibêje: Seyado law ma tu dîn î te serê xwe kiriye ser kevir û piyê xwe daniye ser balgîva nerm? Seyad bersiva Sofî wiha dide: "Bi sala ye ez vî serî datînim cihê xweş û nerm. Lê belê tiştek nemaye ku vî serî neanîbe serê min. Piyên min ji ber vî serê bêaqil tim êş û azar kişandine. Îro jî ez piyên xwe didim rehetiyê. Rehetî mafê wan e ne yê vî serê min î bêaqil e!"



FIRAT CEWERÎ

## Dexs

Gava min xwest ez nivîsekê li ser dexsê binivîsim, tavilê ev hevpeyvîna xeyalî ku min di sala 1987an de bi Celadet Ali Bedir-Xan re kiribû hat bîra min. Ez gotinê bispêrim Mîr:

Firat Ceweri: Her ku ez rewşa me bi bîr tînim, riya gihîştina armancê ewqasî bi min dûrtir dibe mamoste! Ger ez mikur werim û rastiyê bibêjim, problem ne problema milet e; milet yek e, lê serkêşên milet nabin yek. Zana nabin yek, xwende nabin yek, rewşenbîr nabin yek…

Celadet Ali Bedir-Xan: Xorto! Rêya te direj, armanca te hêj dûr e. Lê tu bi rê ketîyî. Herçî ko bi rê dikeve digihe jî. Armanca te armanca çend nifşan e. Ne tenê armanca te û nifşa te. Gelek rêwiyên din dê bên û bidin ser şopa te. Her rêwî riya armancê kurt dikit. Ê nû ji wê dest pê dikit ko pêşiyê wî li wê hiştiye. Rêya te ji ya nifşên din asêtir e. Ji ber ko gîsinê xwe dikî erdekî welê ko hêj tu gîsin lê neketine. Zeviya te beyar e. Divêt gîsinê te ji pola bit, destê te hesin.

– Rast e ku zevî beyar e. Lê mixabin, gîsinê pola jî di nav vê zeviyê de dihele. Tu zanî çima mamoste, ji ber ku em ji hev hez nakin. Ez bawer dikim heta niha bindestmayîna me jî wê ji vê be. Bi saloxan min bihîst ku tu diêşandin û yên ku tu diêşandin jî yên nêzîkî te bûn. Sebeb çi bû? Çi ji te dixwestin? Gelo mirov dikare bibêje ku ev ji ber çavnebarî û dexsê tê?

–Herê Xorto! Birîna me a mezin û xedar dexs e, berberî ye, jana dexsê ye…

– Çima didexisin, ji berdêla ku bidexisin, ma ew jî nikarin tiştekî bikin?

– Hingê ew jî dil dikin tiştekî bikin. Lê mîna tiştê çêkirî an jî çêtir nikarin bînin pê.

– Bila wê çaxê alîkariya çêkiroxan bikin, ma ne ji bo wan e jî?

– Lê heye ko bi awakî arîkariya çêkiroxan bikin û ê çêkirî pêşve bibin û bi ser xin. Lê dexsa wan nahêle.

– Mamoste, dexs tiştekî xerab e, xwediyê xwe dixwe. Bifikire, her cara ku yek tiştekî baş bike ew ê bidexisin, ew dexs wê dilê wan biêşîne, xewa wan li wan biherimîne, wê bêhnteng bibin. Ev hebekî jî dişibe dilxerabî û kumreşiyê. Ev yeka han jî dilreşiyê bi xwe re tîne. Cenabê te ji min çêtir dizane…

– Ax ew jana xedar bi pêsîra wan girtiye, wan diêşîne, dikuje.

–Gelo çima, sebeb çi ye?

–Ji ber ko çênekirine û nikarin çêkin, naxwazin ên din jî çêkin. Çiku ji wan re ne pesn e, ji wan re pê tu nav û deng çênabe. Û holê çavê xwe didin xirabiyê. Ji nekêrhatiya xwe bi tevr û bivir li ser avahiyên ko hinekî din lêkirine, radibin. Li wan dikevin, lê bivir û tevrên wan ne li avahiyan lê li ling û ejnûyên wan dikevin. Tu zanî Xorto ew wek çî û kî ne?

– Ew wek çî û kê ne, mamoste?

–Ew mîna wî mirovî ne ko serê xwe di ser stuyê xwe re tewandiye û li sînga ezmanê zelal tif dike. Tu bi xwe bîr dibî ne, ko gilêz li wan vedigere û dikeve rûyên wan. Ji xwe rêvîn bûn, yekcar dibin seg…

…

– Gava mirov dixebite û bi ser dikeve, hin kes kêfxweş û dilşa dibin, hin kes jî didexisin. Dixwazin bi dexsa xwe dilê mirov bişikînin. Tu ji vê re çi dibêjî mamoste?

– Wekî tu dixebitî dexesker ji dora te kêm nabin. Tu guh mede wan, gotinên wan damêne ber dilê xwe.

– Ger ez di xebata xwe de bişemitim û bikevim, ew ê destê alîkariyê dirêjî min nekin?

– Heke di riya xebata xwe de şemitî û ketî, tu zanî ew ê çi bikin. Mebêje ko ew ê bên bi destê te bigirin, birînên te derman bikin. No, ew ê ji hev du bipirsin, gelo lingê wî neşikiyaye.

– Baş e, gava yek xebateke baş û bi serketî bike, mirovên qenc yên ku alîkariya xebata baş bikin nînin?

– Bi xebata xwe bi nav û deng bibî. Xelkê qenc, xelkê welatparêz pesnê te dê bidin, tu ê giram bibî. Ên dexisok tu zanî dê çi bikin! Mebêje ko bi xelkê re çeplikan li te xin. No, dexsa wan nahêle. Ew ê bêjin: Ma evî çi kiriye, ji bona xwe xebitiye û bi nav û deng bûye, di herderî de pesnê wî didin. Ma ev jî tiştek e.

– Yanî tu dibêjî digel mirovên qenc wê mirovên dexsok jî hebin. Heta, ji ber ku mirov xebateke qenc dike, wê mirovên ku bêsebeb berberiyê bi mirov re bikin jî derkevin.

–Xorto! Herçî ko bi te re berberiyê dê bikin ji te bêtir in. Ji xwe di dewra gelekî de stirî bi hezarî ne.

– Lê ez çi bikim ji wan? Ez jî bi wan re berberiyê bikim, an ez guh nedim wan? Di vî warî de şîreta cenabê te wê gelekî bi kêrî min bê…

– Herwekî min got tu guh mede wan. Herçî ko eleyhdariya te dikin, li ber wan bikeve, ji wan mexeyide. Ew peyayên nekêrhatî û mivro ne. Nikarin, nizanin, ji lewra kurt û pist û kutkuta wan e.

– Mirov dikare vê encamê ji peyvên cenabê te derxe; yanî ez guh nedim der û dorê û di xebata xwe de berdewam bim. Tu bawer dikî ku ez ê bi ser bikevim?

– Xorto! Xebata te mîna dengekî ye. Ma deng bi pifkirinê tête vemirandin. Keda te mîna çirayekê ye. Ma çira kengê bi deng û pêjnê temirîye. Tu her bixebite, qet mesekine, karê xwe bi ser xe.

Dengê te ko ji pifkirinê natirse ew ê her bilintir, çira te ko bi pêjnê nalerize ew ê her geştir bibe.

(Li Mala Mîr, Avesta)



## Almanya sala 2017'an li ser sindoqan derbas dike;

# Gelo dê Merkel kursiya xwe biparêze?



DERYA KILIÇ



**SALA** 2017'an li Almanyayê wek sala hilbijartinan derbas dibe. Hilbijartinên Serokkomariyê di 12'ê Sibatê te pêk hatibûn. 26'ê Adarê de Saarland, 7'ê Gulanê de Schleswig-Holstein û di 14'ê Gulanê de jî li Eyaleta Bakur a Vestfalya hilbijartin pêk hatin. Di 24'ê Îlonê de jî hilbijartinên parlementoya federal hene.

Li gor lêpirsînan partiyên Yekîtiya Kirîstiyanan bi ser dikevin û dê hilbijartin ji bo Serokwezîra Almanyayê Angela Merkel zor derbas bibe. Sedema vê yekê jî polîtîkayên Merkel di derheqê penaberan de wek çavkanî dihatin dîtin. Di navbera Yekîtiya Kirîstiyanên Demokrat(CDU) bi serokatiya Merkel û Yekîtiya Civakî a Kirîstiyanan de mijara penaberan bibû sedema nîqaşên tund.

Serokê berê yê Parlementoya Ewropa Martin Schulz, ji Serokatiya Parlementoya Ewropa vekişiya û biryara domandina siyasetê li welatê xwe da. Schulz bû endamê Serokê Partiya Demokrat a Civakî(SPD). Partî di 19'ê Adarê de çû hilbijartinê û Schulz bû serokê giştî yê nû yê Partiya Civakî a Demokrat û her wiha bû reqîbê Şansolye Merkel. Wek reqîbê Merkel dihat pejirandin lê encamên di hilbijartinên li eyaletên girîng de lêpirsînên gel vala derxistin. Li gor lêpirsîneke ji bo televizyona netewî a Almanyayê di 24'ê Adarê de rayên her du partiyan wek hev derdiketin.

Di hilbijartinên ji bo Parlementoya Eyaleta Saarlandê de CDU ji %40,7 deng stand û SPD jî ji %30 deng girt û bû partiya duyemîn. Di hilbijartinên Parlementoya Eyaleta Schleswig- Holsteinê de jî CDU ji %33,3, SPD ji %26,5 deng stand.

Di hilbijartinên Eyaleta Ren-Vestfalya a Bakur ku wek kelha SPDê dihat zanîn de CDU ji %34,5 û SPD jî ji %30,5 deng stand. Bi vê encamê di eyaleta herî qelebalix de CDU bi serket. Piştî encama hilbijartinên van her sê eyaletên mezin, tê axaftin ku dê Merkel cara çaremîn bibe Serokwezîra Almanyayê.

**Di pêşerojê de çi li pêşiya têkiliyên Almanya û Kurdistanê ye?**

Di navbera Hewlêr û Berlînê de têkiliyên siyasî, dîplomatik, perwerdehî û leşkerî hene. Almanya di 2009'an de li Hewlêrê konsolxane vekir. Wezîrê Karûbarên Derve yê Almanya Frank-Walter Steinmer wê demê beşdarî vekirina konsolxaneyê bû û ji bo vekirina dibistana Almanyayê li Hewlêrê bûbû wesîle. Têkiliyên her du aliyan piştî şerê li dijî DAIŞê xurttir bûne. Wezîra Bergiriyê ya Almanyayê Ursula Von Der Leyen jî di îlona sala 2016'an de serdana Hewlêrê kiribû û di serdana xwe de ragihand ku: "Almanya heta niha 10 hezar Pêşmerge perwerde kiriye, li bihayê 90 Milyon Euroyî çek û cebilxane daye Herêma Kurdistanê. Hevgirtina me ya li hember DAIŞê koordînasyona me jî xurttir kir." Wezîrê Karûbarên Derve yê Almanyayê Sigmar Gabril jî di Nîsana 2017'an de bi fermî serdana Hewlêrê kir û li wir ragihand ku dê piştgiriya me ji bo Herêma Kurdistanê bidome.

Di vê çarçoveyê de me li gel Rojnameger Bekir Siwanî, hilbijartinên Almanyayê û têkiliyên Almanya-Kurdistanê nirxandin.

**"Dibe ku Merkel cara çaremîn bê hilbijartin"**

Rojnameger Bekir Siwanî destnîşan dike ku sedema zêdekirina dengan a partiya Merkel gelek in û wiha pê de diçe: "Di salên 2015-2016'an de polîtîkayên Merkel yên ji bo penaberan li hember Merkel hatin bikaranîn. Ev yek ji bo Merkel pirsgirêk bû. Lê belê civaka Almanya, tesîra hatina penaberan li ser aboriya Almanyayê erênî dît û fikra xwe guherand. Li aliyê din jî polîtîkayên SPDê ên di derheq penaberan de ne diyar bûn. Ev yek jî bû sedema zêdebûna dengên partiya Merkel." Siwanî bi bîr dixe ku Angela Merkel ji bo çaremîn car bibe Serokwezîr endamtiya xwe danî. Li gor analîz û nûçeyan îhtîmalek mezin heye ku Merkel cara çaremîn bibe Serokwezîrê Almanyayê. Siwanî balê dikişîne ser tesîra SPDê û dibêje: "SPD, Martin Schulzî ji bo dengên xwe zêde bike anî. Lê belê di serî de di mijara penaberan û li siyaseta derve û hundirê Almanyayê de di nava Almanan de alozî derket. Ji ber vê yekê jî civaka Almanya berî ku deng bide li bernameyên partiyan dinêre û wisa deng dide. Schulz, wek reqîbekî zîrek derket holê. Lê di demekê de dengên partiya wî kêm bûn. Li eyaletên mezin dengên wan ketin"

**"Almanya û YE, dixwazin yekîtî dîsa bihêz bibe"**

Siwanî, di derheqê penaberan û YEyê de jî wiha axivî: "Almanya û YE, dixwazin yekîtî disa bihêz bibe. Bi taybetî jî serketina Macron li Fransayê tirsa belavbûna YEyê jî kêm kir. Vekişîna Brîtanya ji YEyê belkî tesîreke mezin neke. Hilbijartina Merkel jî ji bo YEyê dê baş be. Ji ber ku Merkel ji mêj ve serokwezîra Almanyayê ye. Di vê demê de di derheqê yekîtiyê de bû xwedî tecrûbeyeke mezin. Almanya, di warê siyasî, polîtîk, aborî û çandî de beşa herî girîng a yekîtiyê ye. Ji bo Yekîtiya Ewropa jî hilbijartina Merkel a herî baştir e.

**"Dê têkiliyên Almanya û Kurdistanê piştî DAIŞê jî bidomin"**

Siwanî, têkiliyên Almanya û Herêma Kurdistanê û proseya piştî hilbijartinan jî nirxand û wiha domad: "Têkiliyên Hikûmeta Merkel û bi giştî jî rêvebirina têkiliyên siyasî, polîtîk li hember Herêma Kurdistanê pozîtîf in. Dê hemahengiya di navbera Almanya û Kurdistanê bêtir bikevin. Wezîre Karûbarên Derve yê Almanyayê di serdana xwe ya ji bo Kurdistanê de ev yek bilêv kir. Dê alîkariyên leşkerî jî bidomin. Di derheqê referandûma serxwebûna Kurdistanê de Almanya hê jî daxûyanî nedaye. Lê ez wisa difikirim ku eger gelê Kurd bi îradeya xwe biryara serxwebûnê bide, hemû dinya dê piştgirî bide wê biryarê.







## Herêma Kurdistanê bergirî li WannaCry kir

# "Ev, şerê teknolojiyê ye"

**NIVÎSBARIYA** fidyeyê ku bi navê 'Wannacry' tê zanîn di 12'ê Gulana îsal de êriş bir ser hemû cîhanê. Ev nivîsbarî compîteran bi şîfre dike û ji bo cardin werin vekirin ji xwediyê compîteran fîdye dixwaze. Di serî de Rusya û welatê Asyayê, bingeha nivîsbariya 99 welatan ziyan ji vê vîrusê dîtin.

Wannacry bi taybetî dosyayan kîp dike û ji bo vekirinê ji bikarhêneran bi pereyê sanal Bîtcoîn 300 dolar dixwazin. Hat zanîn ku hedefa Wannacry vê carê jî Hikûmeta Herêma Kurdistanê ye.

Ev nivîsbariya ku talûkeyeke mezin e, di van demên dawîn de ya herî berfireh e. Li hemû cîhanê, xwe gihande gelek şîrketên mezin û zirareke mezin da wan şîrketan. Virûs xwe gihande Îraqê jî û piştî asteke din ji bo Herêma Kurdistanê jî metirsîdar e.

**Pisborê Compîteran Herdî Mihemed: Îhtîmala li Kurdistanê jî bê dîtin mezin e**

Heftenameya Basê, bi pisbor û berpirsyarên herêmê re axivî. Pisboran diyar kirin ku dîtina vîrusa WannaCry li Herêma Kurdistanê îhtîmalek mezin e. Lêbelê Hikûmeta Herêma Kurdistanê bergirî li hember van êrişan girtiye.

Pisborê Compîterê Herdî Mihemmed ev mijar ji rojnameya me re nîrxand û wiha got, "Heta niha tu agahî nehatiye dayîn ku li Herêma Kurdistanê rastî vîrusa WannaCry hatiye an na. Dibe ku êriş hatibe kirin jî. WannaCry, vîruseke pir bi talûke ye û dikare li her deverê belav bibe. Îhtimalek mezin heye ku êrişek wiha li Herêma Kurdistanê jî bê kirin. Her wiha ev vîrus li Îraqê hat dîtin. Lê nayîn zanîn bê ka li Bexdayê an li Basrayê zirar daye compîteran."

Herdu destnîşan dikin ku vîrusê zaftirîn ziyan daye şîrketên mezin û wiha pê de diçe: "Herêma Kurdistanê li hember êrişeke vîrusî amadekariyên xwe kir û bergirî li hember êrişa sîberî girt. Compîter hatin nûjenkirin û sepanên nûjen tên bikaranîn. Ev şerê teknolojiyê ye. Êdî ji dêvla çekan ve erişên sîberî dê werin bikaranîn. Sedema vê yekê Rusya û DYA (Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê) ye. Ev vîrus ji aliyê Rusyayê ve hatiye derxistin."

**Endezyarê Compîterê Rêber Husseîn: Hemû saziyên me tedbîr standine û amadekariyên xwe kirine**

Endezyarê Compîterê Rêber Husseîn, di derheqê vîrusê û îhtimala gefên vîrusê, ji Heftenameya Basê re axivî. Rêber Husseîn destnîşan dike: "Li Herêma Kurdistanê heta niha tu êriş pêk nehatine û heta niha tu deran zirar ji vê vîrusê nedîtiye. Hisseîn dibêje îhtimaleke mezin e ku êriş li Herêma Kurdistanê jî bên kirin. Lê belê Hikûmeta Herêma Kurdistanê li hember van êrişan amadekariyên xwe kirine. Hisseîn dibêje: " Ez wisa difikirim ku ev vîrus ji aliyê Rusyayê ve hat belav kirin."

> "Herêma Kurdistanê li hember êrişeke vîrusî amadekariyên xwe kir û bergirî li hember êrişa sîberî girt. Compîter hatin nûjenkirin û sepanên nûjen tên bikaranîn. Ev şerê teknolojiyê ye. Êdî ji dêvla çekan ve erişên sîberî dê werin bikaranîn. Sedema vê yekê Rusya û DYA ye. Ev vîrus ji aliyê Rusyayê ve hatiye derxistin."

# Tama siruştî ya çiyayên Kurdistanê: Kivark

BİLAL ADLIĞ

**MEHÊN** biharê li Kurdistanê kivarkên ku mirov ji tama wan têr nabe şîn dibin. Li navçeya Kercewsa girêdayî Êlihê, kivarkên ku piştî baranên biharê derdikevin ser rûyê erdê, ji aliyê gundiyan ve tên komkirin. Şêniyên Kercewsê mîna her sal, îsal jî piştî baranên meha Gulanê, ji bo komkirin û firotina kivarkên ku di vê demsalê de deriyekî debarê ye, berê xwe dan çiyayên herêmê. J ber ku tam û buhayê kivarkên ku di vê demsalê de şîn dibin, gelek zêde ye. Li çiyayên Kurdistanê du cure kivark hene. Jibilî kivarkên xweş û bitam yên ku bo tendûristiya mirovan nebaş in jî hene, lêbelê şêniyên herêmê di vê mijarê de li gor serpêhatiyên xwe yên berê, ji cureyên kivarkan ji hev cuda dikin ku bê ka kîjan baş an jî kîjan xerab e.

Gundiyên li herêmê, bo komkirina kivarkan zarokên xwe jî bi xwe re dibin, mebest ji vê yekê ew e ku tecrubeyên xwe yên li çiyê di vê mijarê de veguhezin bo nivfên nû.

Mixtarê gundê Îloza bi ser Kercewsê ve girêdayî Hasan Turan, taybetmendiyên kivarkên çiyayên Kurdistanê ji Basê re vegot. Keya dibêje, tama van kivarkan xwezayî ye û wiha pê de diçe: "Bi hatina meha Gulanê re li Kercewsê du cure kivark şîn dibin; Kivarkên pez û kivarkên ga. Cureyên kivarkên pez, li bin darên berû û kivarkên gayê jî li bin darên giwîjan şîn dibin. Li herêmê me kivarkên pez zêdetir şîn dibin. Giranî û mezinahiya van kivarkan diguhere û bi navîncî 300 gram e. Heta niha kivarka herî giran ku min ditiye, hezar û 200 gram bû. Kivarkên ku hatine komkirin, bi awayekî baş tên kelandin û piştî spîkirina wan tên sorkirin û tên xwarin. Kivark di nav savarê de jî tên kelandin û xwarin. Piraniya gundiyan bi hatina Gulanê re, berê xwe didin daristanên Çîlo û kivarkan kom dikin. Paşê jî van kivarkên komkirî li bazaran di navbera buhayê 15-17 lîreyan de difiroşin. Taybetmendiya kivarkên Kercewsê ew e ku ji sedî sed siruştî ne. Kesên ku kivarkê sor dikin û dixwin, tama wê dişibînin tama 'Berxê karikan'.



Kivark; Mêvanê bikûmik ê piştî baranên biharê yê çiyayên Kurdistanê. Kivarkên ku ji bo Kurdistanê jî û ji bo xelkê Kurdistanê jî tameke jêneger e û piştî baranên biharê şîn dibin, di nav tamên çiyayên Kurdistanê de cihê xwe girtiye.

## Kivarka ku dişibe goştê berxan...

Mervan Korkmazê ji herêma Hîzana Bêdlîsê jî wiha qala kivarkan dike: "Li herêma me nêzî 10 cureyên kivarkan şîn dibin. Li vê herêmê cureyên herî navdar Kariyê Kirkorê ye û kîloya wê di navbera 250 – 300 lîreyan de tê firotin. Ev kivarka ku tama wê pir xweş e, dema ku hat sorkirin jî weke goştê sor lê tê. Cudakirina vê kivarkê ji goştê sor dijwar e. Em koçer in. Goşt di nava cureyên xwarinên me de xwedî cihekî taybet û girîng e û em tama kivarka Kariyê Kirkorê jî dişîbinin goştê berxan. Dema ku em ji gund ji bo mirovên xwe yên derve tiştan dişînin, em li gor berhemên demsalê tevdigerin. Lewma di mehên biharê de  mirovên me li benda kivarkan dimînin. Kivarkên Keskahiyê û Helêzê, cureyên din in ku li herêma me şîn dibin. Kivarkên Gûz û Spîndar jî weke ku bişîfa tên zanîn.



# Dezgeha hilberîna Kivarkan

Gerînendeyê Kargeha Hilberîna Kivarkan a Pêncwênî, Yusuf Namık radigihîne ku ev tekane kargeh e ku li ser sînorê Silêmaniye û Helebçê kivarkan hildiberîne. Namık, destnîşan dike ku rêjeyeke mezin ya kivarkan ber bi bazaran ve vediguhêzin û daxwazeke zêde heye. Namık, qala damezrandina kargehê dike û dibêje: "Em li ser xwesteka hilberîna tiştekî li ser axa xwe bi rê ketin." Herwiha  Yusuf Namık diyar dike ku ew li sçend welatan geriyane û li kargehên ku kivarkan çêdikin nêrîne. Namık radigihîne ku piştî van çavdêriyan, wan di 2011'an de dest bi çêkirina avahiyê kirine û di 2013'an de jî dest bi hilberîna kivarkan kirine.

"Têra pêwîstiya Kurdistanê kivark hene"

Gerînendeyê kargehê wiha dirêjiyê dide axaftina xwe: "Kargeha me li Pêncewînî û derdora wê ji bo gelek ciwanan derfeta kar derxist û rêjeya bêkaran kêm bû. Em rojane tonek-tonek û nîv kivark digihînin bazaran. Salane ev rêje digihije 300 tonan. Di salên dawîn de Wezareta Çandê ya Herêma Kurdistanê û Gerînendetiya Cotkarî ya Pêncewîniyê di vê mijarê de gelek alîkariya me kirin. Em li benda dewama van alîkariyan e. Li herêmê têra pêwistiya Kurdistanê kivark hene. Em naxwazin ji tu welatan kivark bên kirîn û anîn. Gelek bikirên kivarkên me yên ji heremên Silêmaniye, Hewlêr, Duhok, Helebçe, Kerkûk, Pêncewînî, Germiyan û başûr û naverasta Îraqê hene."

Namık di berdewamiya axaftina xwe de eşkere dike ku projeyên wan yên mezin hene û dibêje eger ku alîkariya wan bê kirin, ew ê rojane 6 ton kivark pêşkêşî bazaran bikin.



## "Kivarkên ku em hildiberînin xwezayî ne"

Şefê Kargehê Erselan Ali jî ji Heftenameya Basê re wiha dibêje: "Em saet 8'an dest bi kar dikin. Di nava 35 rojan de kivark amade dibin. Em di çêkirina kivarkên xwe de madeyên kimyewî bikar nayînin, ji ber wê yekê xwezayî ne. Em giyayê texlê ku di çêkirina kivarkan de bikar tînin, ji Îranê distînin. Beşeke me ya taybet jî tovên kivarkan kontrol dike. Kivarkên ku di kîsikan de tên bicihkirin, 14 rojan di van kîsikan de dimînin. Ev tov heta ku spî dibin di 25-27 pile germahiyê de tên sekinandin."

Hosteyê 15 salan; Eyüp Kurt:

# "Her ku diçe bo kokoreçê eleqe zêde dibe"



GÖNÜL GÜN

Vî hefteyî em bi hosteyê panzdeh salan re li ser hûrgiliyên kokoreça ku him wek cureyeke saqatatê him jî wek xwarina navdar a kolanan tê zanîn axivîn. Kokoreç xwediyê taybetmendiyeke wisa ye ku ew taybetmendî nebûye  nesîbê her cureyê xwarinên goştî. Gelek însan an qet ji kokoreçê heznakin an jî dibin mûptelayê wê. Kokoreç wekî te zanîn yek ji cureyên seqatatê ye û ji roviyên ajalan çêdibe. Ji ber ku di dema çêkirinê de pir zêde di bin agir de dimîne û biharat pir zêde lê tê reşandin hinek di wê baweriyê de ne ku ev ji tendûristiyê re ne baş e. Lê hosteyên vî karî dibêjin ger bi awayekî baldarî bê çêkirin zirara kokorecê tune ye.

**Qonaxên çêkirina Kokorecê...**

Her çiqas çêkirina kokorecê mîna xurekên goşt ên din bê zanîn jî kokoreç xwedî taybetmendiyeke xweser e. Eyub Kurt, Kurdên Haymanaya Enqereyê û hosteyê panzdeh salan a kokoreçê bi rojnameya Basê re axivî. Ji sala 1971'an pê ve malbata wî vî karî dike. Kurt jî di sala 1996'an de, wek şagirt dest bi vî karî kiriye. Kurt niha xwedî dikan e. Heta ku Kurt dikana xwe vekiriye jî bi awayekî seyar li gelek cî û deverên Enqereyê Kokoreç çêkiriye û firotiye. Çawa ku di bajarên Tirkan yên mezin de, di gelek kar û pîşeyan de keda Kurdan heye, xwarina navdar a kokoreçê jî bi piranî Kurd çêdikin. Bêhtir jî Kurdên Agirî, Qers û Heymanayê...

**Ji firinên germahiya 90 pileyî, ber bi destê hostayan ve...**

Kurt diyar dike ku amadekirina kokoreçê du qonaxan re derbas dibe û wiha qala qonaxa yekemîn dike; "Em goştê kokoreçê ango roviyên ajalan dişon, paqij dikin û ji bo ku bê pijandin li şîşan dipêçin. Him ji ber qalindbûna goştê roviyan him dema ku rovî têne şûştin goşt avê digire û him jî ji ber rûnê roviyan bixwe, beriya ku goşt bê firotin di firinên girtî de di 90 pîleyî de goşt bi qasî sedî şeşt tê xaşandin. Goştê ku hatiye xaşandin tê sarkirin û paşê jî goşt diavêjin sarincê

Piştê ku goşt ev qonax derbas kir, bo hosteyên kokoreçê tê firotin. Eyüp Kurt balê dikişîne ser qonaxa duyemîn û dibêje divê di qonaxa duyemîn de kokoreç bi baldarî bê çêkirin. Kurt dibêje ji ber ku paqijkirina rûnê kokoreçê yê bi dezgehê ve di wexteke dirêj de tê kirin, hosteyên kokoreçê di saet 7:00-8:00'an de dest bi kar dikin. Piştî ku paqijkirina dezgehê xilas bû, kokoreçê datînin ser agirê komirê û hêdî hêdî dipêje. Jixwe goştê kokoreçê ji sedî şêst hatibû pijandin niha jî sedî çilê wê tê pijandin. Kokoreç ji bo firotinê di saet 12.00'an de amade dibe.

Eyup Kurt hosteyê panzdeh salan ê kokoreçê yê. Kurt dibêje divê kokoreç bi baldarî bê çêkirin û amaje dike her ku diçe bo kokoreçê eleqe zêde dibe.

**Kokoreç çiqas zû bê firotin ewqas jê tê qezenc kirin**

Kurt amaje dike ku di şîşeke kokoreçê de, 20 nanê bitûn an jî 40 nanê nîv kokoreç jê derdikeve. Kurt dibêje niha li Enqereyê  nîv nanê kokoreçê bi qasî 15 Lîreyî, nanê tam jî 30 lîreyî tê firotin û hosteyê Kurd destnîşan dike ku li gorî semtan bihaya kokoreçê digûhere. Kurt dibêje yên ku di vî karî de dixebitin dikarin debara xwe û malbata xwe bikin lê belê ji bo vê çend divêtî hene.

Kurt wiha qala wan dike, "Kokoreç çiqas zû bê firotin ewqas pere tê qezenç dikin. Çimkî mîna cureyên din ên goşt, goştê kokoreçê jî li ber agir zû dihele û hişk dibe. Bo mînak 'şîşek tam' di saetekê de bê firotin 100 an jî 200 lîre tê qezenç kirin lê belê heman şîş tam di rojekê de bê firotin 100 lîre tê qezenç kirin. Bandoreke nîvenîv li ser qezencê dike."

Eyüp Kurt diyar dike ku çar–pênc sal berê li kolanan bi awayekî seyar firotina kokoreçê qedexe bûye û pê re girêdayî hejmara dikanên kokorecê zêde bûye. Kurt dibêje li Enqereyê sedema zêdebûna kokoreçê ji ber eleqeya kokoreçê ye.

## "Kokoreça resen li ser agirê komirê tê çêkirin"

Kurt diyar dike ku her çiqas hin hosteyên kokorecê bi gazê an jî li ser ızgarê çêbikin jî kokoreca  resen divê li ser agirê komirê bê çêkirin. Sedema jî ev e ku him komir saxlem e him jî goştê ku li ser agirê komirê tê çêkirin bi tehm e. Wek mînak em pir caran dibînin ku li ser dezgehên kokoreçê sator tê bikaranîn an jî goşt tê perçiqandin. Li gorî Kurt divê kokoreç di nava nên de, bi kêrê û giregir bê hûr kirin.

Biharat jî aliyekî din î girîng ê vê xurekê ye. Kurt wiha behsa biharatkirina kokoreçê dike. "Divê biharat bi qelîte be. Biharetên wekî cetilî, kemyon, îsotên hûr li ser kokoreca di nava nên de tê reşandin. Divê em xwê û îsota tûj jî jibîr nekin. Kokoreça resen bi vî awayî tê çêkirin û temam dibe. Van demên dawî, li hin deveran kokoreçên bi sebze yên wekî balcan, îsot tên çêkirin. Ev cure kokoreç ne resen e.

Kurt amaje dike ku ji bo kokoreçeke bi tehm  nan jî girîng e û divê nan ji firîna kevirîn derketibe.



ÎSMAÎL GÜVEN

## Xerabetîya Psîkotîke ya Barebîyayîye

Psîkopatolojî de nêweşîyê cîya-cîya û gelekî balkêşî estî. Ez do no hewte nê nêweşîyanê balkêşan ra yewî bida bi şima naskerdene: Folie a Deux yan zî Xerabetîya Psîkotîke ya Barebîyayîye. Na xerabetî de tewr tay di – rey-rey zî hîrê, çar yan zî hîna zaf- kesî eynî deluzyonan nîşan danî. Nînan ra keso domînant, wayîrê deluzyonan o û bi zafane teşxîsê psîkozî geno. Yanî nêweşo aktîf o. Keso bîn – yan zî kesê bînî- yanî nêweşo pasîf binê tesîrê deluzyonanê nêweşê aktîfî de maneno û bi no hewa deluzyonanê ey nîşan dano. Yanî nêweşo pasîf psîkozê nêweşê aktîfî bare nêkeno, tena deluzyonanê ey bare keno. Labelê eke mudeyê barekerdişê deluzyonan derg bikero, semptomê psîkotîkî yê bînî zî nêweşê pasîfî de asenî.

Mefhûmê Folie a Deuxî reya verêne 1877an de hetê Lasegue û Falretî ra kewt lîteratur. Sewbîna sey Gêjîya Janine, Gêjîya Enfeksîyoze zî name bîyo. Na xerabetîye mîyanê komelî de zaf tay asena, vilabîyayî û gêrîya xo nêzanîyeno û lîteratur de derheqê ci de zaf tay materyal esto. Labelê goreyê cigêrayîşan cinîyan de hîna zaf asena. %92-95ê nêweşan eynî keyeyî ra yî. Hîna zaf mîyanê di wayan, cinî û camêrdan yan zî dadî û gedeyan de asena. Kesanê pabesteyan de hîna vilabîyaye ya. Sewbîna zî, goreyê cigêrayîşan %25ê nêweşanê pasîfan de depresyon, demans û mental retardasyon esto.

Seke cor de zî aseno, na xerabetîye tena mîyanê way û birayan yan zî dadî û gedeyan de nêasena; mîyanê cinî û camêrdan de zî vilabîyaye ya. Coka wina fikirîyeno ke na xeberîye de tesîrê faktoranê psîko-sosyalî goreyê faktoranê genetîkî hîna zaf o. Goreyê Coleman û Lastî na xerabetîye eke nê panc şertî bibê vejîyena werye:

- Ganî nêweşo pasîf, dewranê verênan yê xerabetîya nêweşê aktîfî de binê tesîrî de bimano. Yanî nêweşo aktîf hema rastîye ra dûrî nêkewto.
- Ganî her di zî mudeyêko derg pîya biciwî û mabênê înan de têkilîyêka nêze biba.
- Ganî avantajê nêweşê pasîfî deluzyonanê barebîyayeyan ra biba.
- Nêweşo aktîf çimê nêweşê pasîfî de otorîyeyî temsîl keno.
- Rewşa sosyo-ekonomîkî xirab a.

Goreyê Lazarusî seba vejîyayîşê na xerabetîye ganî di şertî bibî:

- Mabênê kesan de têkilîyê fîzîkî û têkilîyê hîsî yê taybetî estî.
- Nêweşo pasîf hetê genetîkî ra meylê xerabetîyêka psîkotîke bi taybetî zî şîzofrenî yo.

Folie a Deux bi zafanî mabênê di kesan de aseno; labelê rey-rey mabênê hîrê kesan de (folie a trois), çar kesan de (foile a quatre), panc kesan de (foile a cing) diwês kesan de ( folie a douze), heme ferdanê keyeyî de (foile a famille), grûbanê komelkî de (folie a plusieurs) zî aseno. Taybetîya sereke ya na xerabetîye, nêweşo pasîf deluzyonanê nêweşê aktîfî bê îtîraz qebul keno. Xora no qebulkerdiş goreyê deluzyonan vurîyeno. Eke deluzyonê nêweşê aktîfî bi sîstem bê û wina zaf tewş nêbî hetê nêweşê pasîfî ra hîna asan yenê qebulkerdiş: mavaje xirabîye vînayîş, rastê komployî ameyîş. Deluzyonê hîpokontrîakî û yê grandîozî hîna tay qebul benî. Nêweşo pasîf rey-rey zî bi xo, binê tesîrê deluzyonanê nêweşê aktîfî de deluzyonanê cîyayan nîşan dano. Lalebê nêweşo pasîf semptomanê psîkotîkan nîşan nêdano.

Çend tewirê na xerabetîye estî.

Folie İmposee: Nêweşo aktîf deluzyonanê xo dano bi nêweşê pasîfî qebulkerdiş. Nêweşo aktîf, nêweşê pasîfî ra hîna entellektuel û zekî yo. Eke nêweşo pasîf, nêweşo aktîf ra dûrî bikewo beno weş.

Folie Simultanee: Tîya de deluzyonî hîna zaf dewam kenî, mîyanê nêweşan de têkilîyêka nêze esta û hetê genetîkî ra meylê xerabetîyêka psîkotîk ê. Nê nêweşan de deluzyonî eynî wext de, labelê yewbînan ra cîya-cîya dest pêkenî. Tîya de nêweşo aktîf- nêweşo pasîf çin o, coka tena yewbînanracîyakerdişê nêweşan xerabetîye tedawî nêkeno.

Folie Communiquee: Nêweşo pasîf verba deluzyonanê nêweşê aktîfî, mudeyêko derg micadele keno; labelê ser nêkeweno. Badê vîndîkerdişê micadeleyî hem deluzyonanê nêweşê aktîfî nîşan dano hem zî deluzyonanê neweyan ramojneno. Coka tîya de zî tena yewbînanracîyakerdişê nêweşan feyde nêdano.

Folie İnduite: Keso ke wayîrê deluzyonan o, mudeyêk ra dima deluzyonanê sewbîna kesan zî nîşan dano.

Tedawîyê na xerabetîye de yewbînanracîyakerdişê nêweşan cayêko muhîm gêno. Seba ney zî hêverî tesbîtkerdiş û tedawîyê nêweşê aktîfî şert o. Goreyê cigêrayîşan hema-hema heme nêweşê aktîfî teşxîsê psîkozî bi zafane zî yê şîzofrenî genî. Coka tedawîyê nêweşanê aktîfan bi antîpsîkotîkan beno. Dermanan ra dima psîkoterapî dîyena nêweşan. Bi taybetî zî eke gedeyî nêweşê aktîfî ra dûrî bimanî, mudeyêko kilm de deluzyonan ra xelisîyenî. Labelê yewbînanracîyakerdişê kokiman çetin o.

# Referandûm û Xoserî






SEYÎDXAN KURIJ

**WEXTO** ke çend serrî cuwa ver serekê Kurdîstanî birêz Mesûd Barzanî semedê awan kerdişê dewleta Kurdîstanî yanî semedê xoserbîyayişê Kurdîstanî temayê referandûm ard ziwan, a roje ra pey mi bi yew heyecano gird qerardayişê referandûmî pawitene.

Ez ewro zaf keyfweş a ke verî di partîyanê Kurdîstanî PDK û YNK viraştişê referandûmî ser o pîye kerd û cuwa pey zî ê partîyanê bînan de zî qisey kerd û bi yew konsesusa (pîyaameyîşa) semedê referandûmî qeraro qetî girewt. Îtya de bi yew pîyaameyîşo netewîya qerar girewtiş zaf muhîm o. Çunke wexto ke ma biewnî tarîx ra, ma vînenî ke dewletî bi yew pîyaameyişo netewîya yenî awan kerdiş û her persa muhîme ya welatî ancax eşkena bi yew pîyaameyişo netewîya bêro çarekerdiş.

Qala referandûm latînkî ya yena mehnayî, sere pêrodayişê raya şarî. Ewro dinya de referandûm zaf muhîm o, çunke referandûm yew proses o, yew rayîro demokratîk o. Dewletî demokratîkî her persê xo bi referandûm çare kenî. Tayê dewletan de hema-hema her pers bi referandûm yenî çare kerdiş. Sey mîsal zaf rey semedê viraştişê yew rayîrî, awan kerdiş yan zî girewtişê yew hawuzê asno ya, birnayişî darana zî referandûm virazenî.

Tarîx de zafê dewletî bi şer ameyî awan kerdiş. Mileta bindest ver ba mileta serdest şer kerdo, bi şer kolonyalîst erdî xo ra kerdî teber û awan kerdişê dewletê xo îlan kerdo. La ewro referandûm hêna zaf yeno tercîh kerdiş. Nê seranê peyênan de Quebek de, Îskoçya û tayê cayanê bînan de semedê xoserbîyayişa referandûm virazîyayî.

Seke yeno zanayîş yew qismê başûrî welatê ma 1991 de bi azad, 1992 de semedê parlementoyê Kurdîstanî vîjnayiş virazîya û parlemento ame ronayiş. Nê parlementoyî federasyon îlan kerd û Hukmatî Kurdîstan awan kerd. O wext ra heta ewro nê qismê welatê ma bi destê kurdan yeno îdare kerdiş. Heta 2003 no federasyon de facto bi, yanî Îraq no statuyê federasyonî nas nêkerdenî, la 2003 ra pey Federasyonê Kurdîstan bi de Jure (yasayî).

Ge-ge mîyanê kurdan de problem bibî zî esas o wext ra kurdan hewl da ke hem problemanê mîyanê xo hem zî problemanê xo û cîranan bi yew rayîro demokratîk, bi dîyalog çare bikerî. No qerarê referandûmî zî wina yew qerar o. Ewro şert nîyo ke kurdî semedê xoserbîyayiş vera leşkerîyayê Îraqî şer bikerî. Hukmatê Îraqî zî mecbûr o îradeyê şarê Kurdîstanî qebûl bikero. Seke serekê Kurdîstanî birêz Mesûd Barzanî ge-ge vano, şarê Kurdîstanî qeraranê xo bi îradeyê xoyê azad gêno û mecbûr nîyo hesab bido kesî. Heme dewletê cîran û dinya ganî îradeyî şarî Kurdîstan nas bikero.

**Xoserbîyayiş**

Dewletê xo awan kerdiş, yanî xoser bîyayiş yew heqo tebî yo. Her netew heqê xo esto ke dewletê xo awan bikero. Qet heqê yewna netew, yewna yew quwetî çîn o ke welatî yew mileta bînî îşqal bikero û îtya îdare bikero. Seke yeno zanayiş netewe- dewletî yanî dewletî ke yew milet temsîl kenî nê 200 serranê peyênan de awan bîyî. La ewro hema-hema dewletê dinya heme netew-dewlet î. Îtya de tena sey Kanada, Awusturalya çend nimûneyî ra teber netew-dewletanî de yî. Heremê ma de yanî Rojhelatê Mîyanênî de heme netew- dewlet î. Îtya de panc netewê girdî estî, tirk,ereb, faris, yahudî û kurd. Bê kurdan heme miletî waharê dewletê xo yî, tena kurdî mendî bê dewlet. No rid ra dewlet bîyayiş heqê kurdan o tabî yo. Dewletbîyayişê kurdan, yanî xoserbîyayişê Kurdîstanî tena yew heq nîyo, ewro yew zarûret o. Kurd dewlet nêbî hinî nêşkenî xo bipawî, xo qori bikerî. Orte vecîyayişî DAÎŞ

Qetlîamê Şengalî nîşanê ma da ke heta ke kurdî dewlet nêbî qetlîaman ra nêxelisyenî û nêeşkenî dinya de estbîyayişê xo biramnî. No derheq de helwesta Theodor Heus zaf muhîm a. Ez zaf qîmet dana nê vînayişê ey. Seke ma zanî yahudî heme dinya ra bîbîy vila. Mîyanê yahudîyan de fikîro muteber no bi ke ê dinya ra vila bîye û her welat de karanê serkewteyan bikerî. La 1905 de Theodor Heus va: “ma rê yew dewlete lazim a, ma heta dewleta xo awan nêkî, ma nêeşkenî xo bipawî, wina şîyero yahudî benî vîndî, qedîyenî, yanî dinya de yahudî nêmanenî.”

Ez 18 serrî bîya, mi waştenî kurd dewletê xo awan bikerî, ewro zî wina bawer kena. Ewro şertî dewlete bîyayiş başurê welate ma de misaît î, ma ganî nê şertan ra îstîfade bikerî û tarîx de mîyanê dewletanê dinya de bi alaya xo, bi sirûda xo ya neteweyî bi nameyê dewleta Kurdîstanî ca bîgîrî. Yew kurd kam ca de beno wa bibo ganî nê prosesê referandûm û xoserbîyayişê Kurdîstanî rê desteg bidero. Dewleta Kurdîstanî semedê heme kurdanê dinya bibo yew serfîrazîyê. Nika heme dewletan de kurdî yan tirk, yan ereb, yan faris yenî hesibnayiş, o wext kurdî heme parçeyan eşkenî xo dîaspora de sey kurd bidî qeyd kerdiş û her ca de bi sereberzî vajî ke “Ez kurd a. ”

Ez zaf pê şa bîya ke heme partîyê Kurdîstanê Başûrî îlan kerd ke ê referandûmî de semedê xoserbîyayişê rey bidî. Ez hêvî kena ke referandûma pey parlementoyê Kurdîstanî waştena şarê Kurdîstanî ca bîyaro û xoserbîyayişê Kurdîstanî îlan bikero. Ez wazena a roja pîroze de Kurdîstanî de biba.




**Şovalye:** Ti kam î ?
**Merg:** Ez merg a.
**Şovalye:** Ti semedê mi ameyî ?
**Merg:** Ez demêko derg o ke to reyde ya.
**Şovalye:** Ez nika fehm kena.
**Merg:** Ti amede yî?
**Şovalye:** Ez ney la bedenê mi terseno.
.............
**Şovalye:** Deqayêk vinde.
**Merg:** Şima heme wina vanê la ez çîyêk taloq nêkena.

Det sjunde inseglet (Moro Hewtin) 1957/ Rejîsor: Ingmar Bergman

## Mîyanê rîpelan ra:

# Çar kedkarê kirmanckî yê bînî



MUTLU CAN



Suphî Aydın

Nîhat Saganda

**EWRO** kirmanckî payan ser o ya, yeno nuştiş, kitab û kovarî vejîyenê, rojnameyan de ca dîyeno ci. Bêguman no netîceya keda tayê kesan a. Aye ra ma ganî tewr verî ê kesanê ke kirmanckî de eserê verênî nuştê yanî Mela Ehmedê Xasî û Mela Usman Efendîyo Babijî bi rehmet û hurmet yad bikê. Dima ra zî ê kesanê ke vera înkar û asîmîlasyonî xoverdayîşê ziwan û kulturî kerdo, bingeyê nuştişê kirmanckî ronayo, înan bîyarê xo vîr. Înan rê mînetkarîya xo îfade bikerê ke roşnîya çimanê xo seba menfîetê miletê xo xebitnayo. Gama ke ma behsê înan kenê zaf normal o ke tewr verî mamosta Malmîsanij yeno vîrê ma. Tarîxê weşanîyayîşê nuşteyê ey o yewin 1976 o û o çewres serrî ra zêdeyêr o ke kurdkî, tarîxê kurdan û xususen kirmanckî ser o xebitîyêno. Kesê ke ez nameyanê înan mamostayî dima qal bika bêşik mamosta Munzur Çem û J. Îhsan Espar ê. Ez bi xo arşîvan de nêzdî ra bîya şahidê keda nê hîrê şexsîyetan. Tabî tena ê nîyê. Nê karwanî de zaf merdimê biqiymetî ca girewtê; sey Haydar Diljen, M. Selîm Uzun, Çeko Kocadag, Lerzan Jandîl, Seyîdxan Kurij û bi kilmîye ê şexsîyetê bînî ke Grûba Xebate ya Vateyî de ca girewtê/gênê.

Goreyê mi her kamî/ke seba ziwan û kamîya ma çîyê kerdo keda înan a tewr qije daxî resta cayê xo. Mi çend hewteyî verê cû keso biqiymet o ke nameyê ey cor ra zî vîyareno reyde telefon de qisey kerd. Ey cayêk de mi ra va ke “Ez êdî emîn a ke ma ra dima zî bi kirmanckî nusîyeno” Na cumleya ey mi ser o zaf tesîr kerd. Kesê ke fehm bikê seba înan zaf mesajî nimite yê na cumle de. Ke xora mi zî bilasebeb behs nêkerd. Ganî mîras dewrê neslanê neweyan bibo û xebatî bêmabên dewam bikê. Hem zî bi hawayo hîna averberde û dewlemend. Ez bi xo seba ke hurmetê xo nîşan bida kesê ke jenorasyonê yewin yê nuştişê kirmanckî yê înan sey “pilê ziwanê ma” name kena. Înan û keda înan rê hurmet nêmusnayîş û xo mînetkar hîs nêkerdene mumkun nîyo - ez fikrê înan nêzana la- goreyê mi eke mîrasê înan bi xebate nêro xurt kerdene, tena qedr û qiymet zanayîş zaf mana îfade nêkeno.

Baş o ma va kesê ke serranê 1970î tepîya dest bi xebata kirmanckî/zazakî kerda, keda înan pîl a. Ê ke aşiq ê ke nameyê xo her ca ra bivînê zî tede hurmetê ma keda hemîne rê esta. La tayê înan estê ke zafaneyê wendoxanê kirmanckî înan nas nêkenê yan zî zaf nas nêkenê, xebatanê înan ra xeberdar nîyê. Ma wazenê nê nuşteyî de çendê înan şima rê bidê şinasnayîş.

**Mustafa Düzgün**

Mustafa Duzgun, wexto ke keyeyê xo ê wextan uca surgun gun bîyo, serra 1945î de dewa Öksüzî ya qezaya Banazî (Uşak) de maya xo ra bîyo. Keyeyê ey wexto ke o 2 serreyî bîyo agêrayo Dêrsim. Mektebo verên û mîyanên qezaya Mazgêrdî de wendê. Lîse Adana da qedenayo û 1972 de Beşê Felsefe yê Fakulteyê Edebîyatî yê Unîversîteya Îstanbulî ra mezun bîyo. Lîseyanê cîyacîyayan de mamostatîya felsefe kerdo. Cuntaya 12 elûle 1980î ver menbur mendo ke welatî terk biko.

Gama ke merdim behsê ey keno ganî verê verkan behse yew kovare biko; Berhem. Na kovare hetê Mistefa Duzgunî ra ameya vetene. 1988 de de dest bi weşanê xo kerdo û goreyê zanayîşê mi pêsero 16 hûmare aye weşanîyayê. (Goreyê tayê çimeyan 12yê xo Stockholmî, 7ê xo Anqara de 19 hûmarî çap bîyê. La mi bi xo 16 hebî diy.) Kovara Berhemî ke bi hîrê lehçeyan (kurmanckî, kirmanckî û sorankî) weşan kerdo û binê nameyê aye ra no îbare; Kovara Lêkolînên Civakî û Çandî [Kovara Cigêrayîşanê komelkî û kulturîyan] aseno. Kovara Berhemî de edet, folklor û rîtuelanê elewîyanê Dêrsimî ser o epey nuşteyî ameyê weşanayîş. Ma vînenê ke qismê înano muhîm bi nameyê ey (M. Duzgın, M. Dûzgûn) weşanîyayê.

Torey ve Adetê Dersîmî, Hej.: 1, 1988, r. 34-40

Torey ve Adetê Dersîmî -II-”, Hej.: 2, 1988, r. 18-27

Dersım de Kewrayên, Hejmar: 3, 1988, r. 48-50

Adet u Toreyê Dersımî -IV-, Hej.: 4, 1989, r. 18-19

Adet u Toreyê Dêrsimî -V-; Misavyênî”, Hej.: 6, 1989, r. 32-35

Adet u Toreyê Dêrsimî; Zewaz Dîlbaxî, Denîşkar, Dermal, Hej.: 8, 1990, r. 33-39

Vatenê Verênan”, Mintiqa: [Dêrsim], Hej.: 9, 1990, r. 58-64

Şaîrê Dêrsimî Bava Sey Qajî, Hej.: 10, 1991, r. 62-69

Nê corênan ra teber babetanê sey tarîxê felsefeya rojawanî, serranê şerê cihanî yê yewinî de Kurdîstan, elewîtîye ser o zî xebatê ey estê. Duzginî kirmanckî ra teber bi kurmanckî û tirkî zî nuşto. Bi nameyê Çend Sanikê Ma Çend Çirokên Me yew kitabo ke hetê ey, Gulperîye, Rıza Çolpan û Bîlal Görgüyî ra nusîyayo esto. Nê kitabî de bi kirmanckî û kurmanckî çend sanikê folklorîkî estê. Serra 1993 de, Anqara de hetê weşanxaneyê Berhemî ra ameyo çap kerdene. (Kitab de di sanikê kirmanckî yê mintiqaya Dêrsimî ca gêne; Sayê Moro û Wereza Be Xalciniye Ra, Nînan ra Sayê Moru hetê Metîn û Kemal Kahraman birayan ra sey album ame muzîkalîzê kerdene û dima serra 2011î de Îstanbul de hetê tîyatroyê Seyr-i Meselî ra sey kayêko muzîkal ame sexnekerdiş.

Di kitabê ey ê bînî estê. Nameyê yê yewinî Dersim Türküleri Tayê Lawikê Dêrsim o. Nê kitabî de tewir bi tewir kilamê/deyîrê folklorîkî ke Dr.Vet. Nurî Dêrsimî, Dr. Şivan, Hawar Tornêcengi, Munzır Comerd zî tede hetê heşt kesan ra ameyê arê dayenê weşanîyayê. Kitab 384 rîpel o û 1992 de Anqara de hetê Weşanxaneyê Berhemî ra çap bîyo. Yewna kitabê ey esto ke H. Tornêcengî û M. Comerd de pîya amade kerdo. O zî kitabêko folklorîk o û tede cîyacîya melzemeyê folklorîkî ke mintiqaya Dêrsimî ra arê dîyayê estê. No kitab zî 1992 de, hetê eynî weşanxaneyê ra Anqara de çap bîyo. Goreyê melumatê ke birayê ey Şahan Duzgunî day mi Mustafa Duzgun nika Swed de ronişeno û ge-ge Unîversîteya Vîyana de dersan dano.

**Elî Tayfun ( Hesenî Giran )**

Mamosta Elî Tayfun, 1949 de yew dewa Pîranî de maya xo ra bîyo. Demêkê dergî de Dîyarbekir de mamostayî û avûkatî kerde. Rojnameyanê Armanc û Newepelî û kovaranê Berbang û Vateyî de kirmanckî (zazakî) nuşt. Naznameyê ey Hesenî Giran o. Tayfun birayê mamosta Mehemed Malmîsanijî yo. Ey zaf ehemîyet dayêne nuştena kirmanckî û heyf ke 05. 08.2012 de dinyaya xo bedilnaye. Ma bi no wesîle ey bi rehmet û hurmet yad kenê.

**Çend nuşteyê ey ê ke mi tesbît kerdê nê yê:**

**Armanc**

Diyarbekir Di Şewa Heqê Mêrdim, Hej.: 111, 1990, r. 10

Diyarbekir Di Sernewe û Tesîrê Cengê Kuweytî”, Hej. 112-113, 1991, r. 10

Diyarbekir Di Sernewe û Tesîrê Cengê Kuweytî (II), Hej.: 114, 1991, r.10

Diyarbekir Di Sernewe û Tesîrê Cengê Kuweytî (III), Hej.:115, 1991, r. 10

Mektubê Diyarbekirî, , Hej.: 120, 1991, r. 10

Him Kişenî Him Danî Mehkem, Hej.: 121, 1991, r. 10

Diyarbekir Di Di Hewteyê Peyenê Serra 1991’î, Hej.: 124,1992, r. 10

Diyarbekir Ra, Hej.: 125,1992, r. 10

Diyarbekir Di Yew Kongre, Hej.: 126,1992, r. 10-11

Diyarbekir Di “AÇiqlik Çarig O!”, Hej.: 127, 1992, r. 10

**Vate**

Mektube, Hûm.: 3, 1998, r. 110-112

Hûmarê ke tede nuşte û arêdayîşê ey ê folklorîkî weşanîyayê nê yê: 19, 3 (23), 4 (24), 5 (25), 8 (28), 9 (29), 10 (30), 11 (31), 12 (32), 13 (33), 14 (34)

**Newepel**

Alî Tayfun; Mektube, Newepel, Hûm.: 3, 2011, r. 7 (mesaj)

Hajî Leglegi, , Hûm. 6, 2011, r. 7

Şermizakerdiş!, Newepel, Hûm.:7, 2011, r. 4


Çend Rojê Swêdî, Newepel, Hûm. 17, 2011, r. 6

**Berbang**

Diyarbekir Ra Roj bi Roj, Berbang, Hej.: 2/91 (70), Stockholm, Mars 1991, r. 32-34



Mustafa Düzgün



Elî Tayfun

**Suphî Aydin ( Hûmanê Çîyan )**

Suphî Aydin, 04.10.1954 di dewa Sarcon ke girêdayeyê qezaya Depe ya (Xarpêt) de maya xo ra bîyo. Dewa xo de dest bi wendiş kerdo. Dima ra pîyê ey o erşawito Adana. Mektebo verên û yê mîyanên tîya qedaneyê. Lîse Depe de temam kerdo û 1977 de şîyo Almanya. Unîversîte bajarê Bremen de qedena. Almanya de xebatanê sîyasî û kulturîyan yê kurdan de ca girewt. Ey bi xo sey deyîr, vateyê verênan, sanike ûêb. gelek melzemeyê folklorîkî arê kerdê û rojname û kovaran de weşanayê. Aydinî kovara Dengê Komkar, rojnameyanê sey Ronahi, Azadi, Dengê Azadî de kirmanckî nuşto. Ey çend naznameyî (mehlasî) xebitnayê. Înan ra o ke tewr zaf xebitnayo Hûmanê Çîyan o. (Aydin, eynî wext de bi no nazname beşdarê di kombîyayîşanê Grûba Xebate ya Vateyî bîyo.) Ê bînî Dersim Şoreş, Azad Dildar û Lacek Şımaran ê. Ma ganî îlawe bikîme ke ey bi xo tena kirmancî ney tayê arêdayîşê kurmanckî zî kerdê û tay bo zî bi na lehçe zî nuşto.

Goreyê zanayîşê mi bi nameyê Henarek yew kitabê ey weşanîyayo. Nê kitabî de sanikê kirmanckî ke ey mintiqaya Depe û Çewlîgî ra arê dayê ca gênê. Noto bîblîyografîk yê nê kitabî wina yo:

Aydin, Suphî, Henarek: Kitab Sonikon, Weşanên Apecê, Swêd, 2013, Çapa dîyine: Henarek – Granatapfelchen: Welat Şêrq Ra Sonîk/Marchen aus dem Morgenland, Landeszentrale für polistische Bîldung Hamburg, Hamburg, 2015

Aydin, nika Almanya de ciwîyeno. Herçiqas kovar û rojnameyan rê nênuseno zî xebatanê xo domneno. Ez sey yew nimûne îlawe bika; çend aşmî verê cû seba ke fikrê mi bimuso yew dosyaya xo mi rê erşawite. Muhtewaya aye de gelek şîîrê Nazim Hîkmetî ke hetê ey ra çarnîyaybî kirmanckî ser estbîy. Çîyo peyên o ke ez derheqê ey de vaja no yo; çend kesanê ke kirmanckî de zaf arêdayîşê folklorîkî kerdê û weşanayê, Suphî Aydin [Hûmane Çîyan] înan ra yew o.

**Nîhat Saganda ( N. Elî )**

Nîhat Saganda sêwregij o. Sey zafê embazanê xo, wextê cuntaya 1980î de welat terk kerdo. Armanc de û hûmara yewine ya kovara Vateyî de bi no nazname (N. Elî) kirmanckî nuşto. Çend metnê verênî ke kurmanckî ra ameyê açarnayîş, di hebê înan yê ey ê. Keso verên o ke Ehmedê Xanîyî ser o nuşto û nuşteyê xo de ca dayo çend hebî beytê Mem û Zîn ke bi xo çarnayê kirmanckî ser. Heyf ke 1997î ra tepîya nuştişê kirmanckî ra fek veradayo. O bi xo nika mîyanserreyî yo û Swed de ronîşeno.

Qedrîcan; Mûyênda Sipî, N. Elî (kurmanckî ra tadayox), Armanc, Hûm.: 136, 1993, r. 10 (hîkaye)

Wesiyetê Hacî Ehmedî, Armanc, Hej.: 138, Nîsan 1993, r. 10 (xatira)

Can, Qedrî; “Serencam” (kurmanckî ra tadayox: N. Elî), Armanc, Hej.: 1 [159], 1995, r. 15 (hîkaye)

Sêwrega 25-30 Serran Ra Ver û Tanî Vîrameyinî, Vate, hûm: 1 [159] , 1997, r. 21-23

300 Serreya Nuştişê Mem û Zîn û Hewnê Ehmedê Xanî, , Hej.: 4 [162], 1995, r. 27

Kêmî yan zêde muhîm nîyo înan nuşto, berpirsîyarîya xo goreyê îmkananê xo ardê ca, Seke şima zî zanê û vînenê çîyo nuştekî vîndî nêbeno, maneno. Bi ziwanê dayîke nuştene, karê ziwan û kulturî aver berdene belkî tewr zaf zî seba ma kurdan xususen ma kirmancan hewce yo. Helbet keda çi kesî/e xo vîr ra nêbena. Xora amancê nê nuşteyî zî tayê o nêbî? Ma va nê çar kedkaranê kulturê ma bi şima bidê şinasyayîş û bi no qayde keda înan zî bi hurmete yad bikîme. Baş o, ma çend îfadeyanê înan neqil bikê û bi no hewa nuqte ronê.

“Serrê bêxeyretey tepa mendî. Wext wextê xeyretî yo. Xebat û eleqedarey lazim a. Ma pêrûni rî wezîfe kiweno. Ez bawer kena ki lehçey zazakî ser o no xeyret dewam keno, vînî nêbeno. Hetanî ki dinya esta zanê ma û kulturê ma zî wa ridê dinya di mano. No xusus di bawereya ma ya ebedî esta.” (**Hesenî Giran**, Vate)

“Zaf miletê ke 300 serre ra ver haya înan neteweyey ra çinebî ewro wayirê dewlet ê, labelê ma Kurdî ki Ehmedê Xanî yê ma estbi ma hewna bê dewlet ê û ciyakewte yê. Lazim o ki ma Ehmedê Xanî newera biwanê û bixebitiyê ki Hewnê ey bikerê raşt.” (**N. Elî**, Armanc)

“... Tayê saro bîn kî ya binê tesire na kesonê sareteng u zeretengo de mendo, ya kî xeleto û çewtonê îno nano ra rîyê xo ver u îda keno ke Zazayî Kurd (Kirmanc) nîyê u Zazakî zonode bîno. Oncî nî mordemî, faktoranê tarixî u camatîye nêcênê çimî ver – hama jê tayê zanoxanê Awrupayîzotêyna vurênayîna vengo u formonê qeso ve ca u sira îno ser o vindenê...”

(**Mustafa Düzgün**, “Dimilî Kî Zonê Ma Wo...”, Kurdistan Press, Hej.: 71 (17), 1989, r. 9)

“... Ti çond welat ra xwi dûrfîn, wi hîna yen nizdîyê merdim. Emir ma pê xebat û xwiverdayiş semêd welat, zon û kultur ma ya sê macîron ni welat xerîb di şi. Ma vac ma hezaron ra km welat xwi ra kot dûr, la mezg û zerrê ma semêd welat û xelasê yi ya dona pirîye. Şar yen na dunya di cuyen, yow tahm ti ra gen. La ma kird tim hay teqe req dê, ge yên kiştiş, ge zî mecbûr bên xwi querêk pan merdimon heramzadon ... Honc ma vac bena hol, bena rind, tîjê wêşîyê û serfîrazê, serbestîyê û azadî yow ruej welat ma ser di bena berz û şar welat ma zî pê rueşnayê, germê û berekêt eya tîja newî ya bên şa ...” (**Suphî Aydin**, mektuba dîgîtal a ke ey mi rê nuşta, aye ra)



MURAD CÎWAN

## Reformên arastekiriyên bo desthilatê

Piştî rapirsîna destûrê, Tirkiye li ber dergehê hin guhertinan e. Beşeka wan ew qanûn û rênuma ne ku divê li destûra nuh bên anîn. Yên din, zêdetir ew in ku piştî referandûmê mecbûriyeta bicîhkirina wan serî hildaye.

Bi taybetî ku 'erê' di rapirsîyê de bi ferqeka marjînal a 'sîratîn' (1,4%) hat biserket û 'neyek'a endîşeder a nêzî 50% hat pêşber, di ser de jî li metropolên mezin rêjeya nagoyan ket pêşiya erêgoyan, zenga wendakirina desthilatê ji bo Ak Partiyê û Erdoğan lêda.

Serokatiya Erdoğan, ji bo misogerkirina desthilatê di hilbijartinên êbê de, da çembereka piştgiriyeka firehtir a civakî li dora xwe ava bike, mecbûr e dest bavêje hin reforman.

Xerîteya civakî-siyasî ya piştî rapirsînê, hin diyardeyan radixe ber çavan: Hevkariya bi MHPê re ew dengên neteweperest ên hêvîkirî bi xwe re neanîn. Qezenca ji hevkariya li gel MHPê ketiye bin gumanan.

Ew wesayetgêrên avrasyaxwaz, nasyonalîst û ergenekonî îşareta desteknedanê didin Erdoğan, hela hela Ak Partiyê.

Rola kurdan di sîstema bidestxistina desthilata Tirkiyeyê de gav bi gav zêdetir dibe. Baweriyek heye ku di rapirsiyê de dengên kurdan erê biser xist.

Ku behsa rola kurdan dibe, divê du fenomenên nuh bên dîtin. Ya xwiya, ji 7ê hezîranê bi vir de, çi dibin bila bibin; sunî, elewî, dîndar, mihafezekar, rast an çep; kurd bi hayjêhebûna kurdbûnê jî tevdigerin, 'rengê kurdbûnê' di dengên wan de diyar e.

A din, êdî kurdên li metropolan, bi kêmtirîn qasî kurdên li Kurdistanê, belkî ji wan jî xurttir viyana xwe diçespînin meydana siyasetê. Li bajarên rojavayê Tirkiyeyê bi milyonan kurdên nebişaftî yên ji yek-du sed salên dawî bicîhbûyî hene. Ne kêmî wan asilkurd ên entegrebuyî/asîmîlebûyî hene ku ew di Ak Partiyê, MHPê, CHPê û partiyên din ên Tirk de ne. Esilkurdiya wan dibe faktoreka guherîna dengên wan ji partiyekê ber bi ya din ve li gor konjukturan rewşên rasyonel.

Ev diyardeya nuh a li rojavayê Tirkiyeyê rola kurdan û esilkurdan nêzîkî hev dike û bikêrhatineka wiha didiyê ku, ji MHPê heta HDPê xwe dixe hevsengiya nav partiyan û di civakê de jî nermbûneka xweşbînîyê dide. Potansiyela kurdan li seranserê Tirkiyeyê bi aliyê xwe yê dîtî û nedîtî mestir dibe, kartêkirina yên rojava dikeve pêşiya ya yên Kurdistanê bitesîrtir.

Di rapirsiyê de nagoyên nav Ak Partiyê muhtemelen ji encama faktoreka wiha bû.

Gava xerîe ev be, Ak Partî û Erdoğan gelo ê çi guhertinan bikin? Ji bo texmîneka qenc lazim e du tişt li ber çav bin:

Yek jê, çerçeweya guhertinan ê viyana Erdoğan be ne ku ya Ak Partiyê. Ak Partî hê roja roj sîstema 'meşwereta îslamî' di mekanîzmayên xwe yên biryardanê de kir esas. Di partiye de herkes xwedan dîtin û pêşniyariyan bû bi şertê ku mafê biryardanê yê serokê partiyê be.

Di destpêkê de hin kesayetiyên demezrêner û palder xwedanê giraniyekê bûn, Erdoğan di biryarên xwe yên dawî de hesabê wan dikir. Îro derûdor û kesên wiha derketine derveyê platformên raavakir. Êdî sîstema pêbestbûn, bawerpêkirin û sedaqeta li gel serok, meşwereta di partiye de kiriye desthilateka takedestiya mutleq.

Ya din, guhertinên pêwîst dîtî, ne ji dînamîzmeka reformxwaziyê, lê ji pragmatîzmeka misogerkirina desthilata hilbijartinên êbê tên. Erdoğan ne kesekî reformxwaz lê pragmatîstê arasteyî hêz û serkeftinan e. Barometreya hilbijartinên bidestxistina desthilatê dikare wan pêşde-paşde bibe, teng û firehtir bike. Hesabê nasyonalîstên tirk ê bê kirin, lê ne bi hêviyeka mezin, lazimiya dilxweşkirina kurdan ê faktorek be. Belavkirin û berhevkirina rêjeya %49ê ferz e.

Faktorên jidestnedana desthilatê ne tenê li hundur, li derva jî hene. Bi DYAyê, Ewropayê, YE, NATOyê û Rusyayê re ê pêwendiyên çawa bên ristin? Bi panîka lihevhatina li gel Rusyayê Erdoğan gelek serî li Putin tewand, lê encamên ku dixwest negirtin. Ew li hemberî hemû serokên Ewropayê jî hatiye hemberî hev.

Serkeftina Trump bû take-guliya xwepêgir. Trump Erdoğan pîroz kir, ew vexwend welatê xwe û deriyê şerî'yeta rapirsîyê û serokatiya Erdoğan li Rojava vekir.

Lê pirsgirêka Cemaeta Gülen û dosyeya dadgehkirina Reza Zarrab wek du stiriyan ketine navbera nêzîkbûna Erdoğan û Trump. Eger Trump di van herdu xalan de Erdoğan qan'i bike, di siyaseta li gel DYA û Rojava de nermbûn û germbûnek dikare rû bide. Ev ê zemîna hevkarî û hevahengiya Tirkiyeyê û DYAyê li Rojhilata Navîn xweş bike. Li Suriyeyê û Iraqê nuha xetimandinek hebe jî, êbê derfetên hevkariyên stratejik dide. Doza kurdan yek ji van e. Destêwerdana Îranê di Iraqê, Sûriyeyê, Lubnanê û Yemenê de dikare DYA, Îsraîl û Tirkiyeyê li gel hin welatên Rojhilata Navîn bigihîne hev.

Hidûdê reforman di vê çarçeveyê de ê arasteyê misogerkirina desthilatê bin. Hemû ji destpêkê de ê neyên plankirin, li gor termometreya gurrbûna agirê hilbijartinan ê kêm-zêde bibin, lê qet ê nebin reformên bingehîn.

# Bûbê Eser, 'Dîroka Rûreş' vegot



MURAT ÖZDEMİR

Rewşenbîr û nivîskarê Kurd Bûbê Eser jî bi armanca vekolan û vegotina jenosîda Enfalê, di 1'ê Gulana 2007'an li bajarokê Bilê bicih bû û zêdetirî 7 mehan li Bilê û Hewlêrê xebatên xwe meşandin. Bûbe Eser di encama van xebatên xwe de Şanoya Enfalê bi navê 'Dîroka Rûreş' li swêdê di 25 saliya (2008) Enfala Barzaniyan de, da weşandin. Romana wî ya li ser 8 hezar Barzaniyên Enfalkirî berdewam dike. Bûbe Eser xebat û lêkolînên xwe yên li ser vê birîna giran ji bo Basê vegotin.

Herwiha Bûbe Eser ku 7 mehan li herêma Barzan ma û bi malbatên enfalkiriyan re rûnişt û guhdariya kul û derdên wan kir. Bûbe Eser, dê her hefte bi riya rojnameya me hevpeyvîn û lêkolîneke xwe ya di vê bareyê de bi we re parve bike.



Li Başûrê Kurdistanê di destpêka salên 80'yî de li dijî miletê Kurd rejîma Baas operasyonên jenosîda Kurdan dan ber xwe û di encamê de zêdetirî 182 hezar zarok, ciwan, jin, mêr û kalên Kurd hatin qetilkirin. Herwiha di encama vê jenosîdê de tenê ji malbata Barzaniyan 8 hezar mêr hatin qetilkirin.

**"Her tişt bi saya nivîsandinê zindî dibe û namire"**

Bûbê Eser ji bo nivîsandina romana enfalên 8 hezar Barzaniyan li devera Barzan bi cih dibe û vê proseyê wiha vedibêje: "Ji ber ku Barzaniyan her pêşkêşiya gelê xwe kirine û hîn jî dikin. Loma min jî weke yekî ku li ser rêbaza Barzaniyê nemir, berê xwest li ser Enfalkiriyên wan vî karî bikim. Ya din ev weke pêşniyar jî ji aliyê Şêx Feryad Barzanî ji bona min hatibû ku ez bi karekî wiha rabim. Min jî ew pêşniyar pesinand û dest bi karekî wiha kir. Lê Enfal ne tenê ew in. Bi giştî 182.000 malbatên Enfalkirî hene. Ya din jî weke tê zanîn ku îro li vê dinyê her tiştek bi saya nivîsandê zindî dibe û namire. Loma min jî biryara nivîsandina roman û şanoya Enfalê ji bona ku ew tim di rojava cîhanê de zîndî be da û nivîsî."

**"Min xwast Enfalê bi cîhanê bidim nasîn"**

Nivîskar û lêkolînerê Kurd Bûbe Eser axaftina xwe wiha didomîne; "Ji ber ku ev mijar nebûbû mijara nivîskarên me yên li her çar perçeyan. Loma min xwest ku jiyana dayik û jinên li dû mêr, bav û birayên xwe mane çawa jiyane, binivîsim û vê bi cîhanê bidim zanîn. Kêfxweş bûm ku ev kar ji min dest pê kir. Ya girîng jî ew e ku piştî azadiya şerê mezin, şerê qelemê û nivîsandinê ye. Loma divê em kurd jî êdî vê bikin."

**"Xelkê deverê canik û camêr, fedekar û welathez bûn"**

Bûbê Eser li ser çavdêriyên xwe yên bo devera Barzan dibêje: "Dema min li wir dest bi karê şano û romanê kir, min xwest berê kesên wir binasim. Bi rastî jî xelkên deverê hemû canik û camêr, fedekar û welathez bûn. Wan dixwest gelek tiştan bidin min, serpêhatiyên xwe ji min re gotin, êş û azarên ku kişandibûn ji bona min vekirin. Ew bi min re bûne heval. Belkî cara ewil tiştên bi serê wan de hatibûn ji bona min gotin. Yanî wan gelek tişt dane min. Lê min jî tenê niha şanoyek diyarî wan kir û hêvîdar im ez ê romana wan jî di demekê nêzde diyarî wan bikim. Romanek baş bi piştgiriyeke xurt dikare gelek tiştan bike û di armanca xwe de jî serbikeve."

**"Dayîkan him sebir dikirin û him jî hewla mezinkirina zarokên xwe didin"**

Di dirêjiya çavdêriyên xwe de Eser dibêje: "Ez bi xwe bawer nakim ku li cihanê jibilî dayikên Kurdan tu dayikên din ewqasî bikaribin li hember kerasetên wiha sebir bikin. Lê dayikên devera Barzan him sebir dikirin him jî dixwestin li hember hemû karesatên bi serê wan de hatine zarokên xwe mezin bikin da ku ew jî weke bav û bapîrên xwe li ser rêbaza Barzanî tekoşîna azadiya gelê xwe bidin."



## Bûbê Eser kî ye?



Bûbê Eser di sala 1955an li gundê Xozberiya Dêrika Çiyayê Mazî ku navçeya Mêrdînê ji dayîk bû. Dibistana seretayî li gundê Qesra Qenco, Navîn û Lîse jî li bajarê Mêrdînê sala 1973'an qedand. Sala 1975'an dest bi xwendegeha bilind zankoya aborî li Enqereyê kir. Bûbe Eser ji ber xebatên xwe yên siyasî ji aliyê hêzên ewlekariyê ve hat girtin û 72 rojan di bin îşkencê û nêzîkî 3 salan jî di girtîgeha Diyarbekirê ya bi navê 5 nimera (5 no'lu), de ma. Piştî îşkenceyên mezin tendûristiya wî xera dibe û ji neçarî berê xwe dide derveyî welat, Swêdê. Heta niha 7 berhemên wî hatine weşandin. Yek ji wan jî şanoya 8000 Barzaniyên Enfalkirî ye.

## "Dever her digiriya û dida girî"


Lêkolînerê Kurd di berdewamiya axaftina xwe de di derbarê dîtina xwe ya herî balkêş de wiha diaxive: "Gelek tiştên balkêş hebûn, lê ya herî girîng ew bû wan dixwestin zarokên xwe mezin bikin da ku li ser rêbaza Barzaniyê mezin bin û ji bona azadiya welatê xwe kar û xebatê bikin. Ya din wan dayikan heta cenazeyên Enfalan hatin (2003) li benda zilamên xwe bi hêviya ku wê rojekê vegerin sekinîbûn. Li gor min jî ya girîngtirîn ew e ku dever her digiriyan û didin girî. Lê ez jî qederê 7 mehan bi wan re giriyam. Dema li malên wan dibûm mêvan û pirsa Enfalê dikir, hemû kesên malê dest bi girî dikirin, ez jî bi wan re digiriyam."

## "Heta niha jî rewş û jiyana Enfalê nehatiye zanîn"

Bûbe Eser di dawiya gotinên xwe de wiha pê de diçe: "Heta niha jî rewş û jiyana enfalê nehatiye zanîn. Enfal ne tenê 8000 zilamên Barzaniyan e û bi tevayî 182 000 in. Dayikekê çawa zarokên xwe mezin kir, zarokekî ku li dû bavê xwe çêbûbû ji bona wî bav dihate çi wateyê? Sala 1983'an piştî enfalkirina 8 hezar mêrên Barzaniyan, zilam li deverê neman. Ji sala 1984 û heta 1992'an li devera Barzan zarok çênebûn. Kes di navbêra 8 salan de nezewicî û ji xwe mêrên ji 12 salî pê ve hemû hatibûn enfalkirin. Loma ez dibêjim ne 8000 hezar zilamên Barzaniyan hatine anfalkirn gelek 8000 hezar in.

Bilal Çelik:

# Roleke wergerê jî ew e ku ziman dîsa vegerîne ser rihê xwe








CIWANMERD KULEK

Bi rastî werger kengî dest pê dike? Dema çand li hev biqelibin, têkilî xurt bibin, li wê derê werger jî xurt dibe û rola wergerê jî derdikeve holê.

**Wergernasî wek zanist kengî ket nav akademiyê?**

Karê wergerê jixwe ji berê de hebû. Lê di 1972yan de wergernasekî bi navê James Holmes di konferansekê de teqdîmek bi navê *Nav û Siruşta Xebatên Wergerê* pêşkêş kir. Holmes di wir de karê wergerê dabeş dikir wek wergera sepandî û wergera xwerû ku di bin banê xwe de ya teorîk û ya salixder dihewand. Roja îroyîn jî, dema em dimeyzînin, bêtir xebatên wergera salixder (descriptive) pêş ketine bi teorîyên Gideon Toury û Even Zohar . Vêca fêdeya vê çi ye, em dikarin li ser vê bifikirin. Çima ev pêdivî pêk hat û wan xwest ku wergerê bikin zanisteke serbixwe û li gor hin teorîyan nêzîkî tiştên nivîskî bibin? Bi rastî dema mirov bi çavê wergerê li hin metnên olî, wêjeyî yan zanistî dimeyzîne, mirov dibîne ku tiştekî din derdikeve. Li ser meseleyê, Gideon Toury dema werger rave kiriye gotiye "çandek çi wek werger qebûl bike ew werger e." Yanî qada wergerê berfireh kiriye.

**Nexwe werger li her dem û li her şûnê ne heman tişt bûye. Di nav sal û zemanan re şêwaz, bizav yan maneya wergerê çawa guheriye?**

Eger tu bi çavê wergernasiyê lê bimeyzînî, wexta te got 'werger' divê li gora dema wê û çanda nivîskî a wê demê wê binirxînî. Em bibêjin di kurdî de jî, di tirkî de jî, di çandên rojhilata navîn yan di çandên dî de jî –çi îngilîzî, çi fransizî, ferq nake –çiqas tu bi berê de diçî sînorên wergerê berfireh dibin û carina dikevin nava hev jî. Bo nimûne, îro dema dibêjin 'berhemên telîf' em tiştekî fêm dikin, dema dibêjin 'werger' em tiştekî dî fêm dikin, em dizanin çavkaniyek heye û nivîskarekî vê çavkaniyê heye û em wê çavkaniyê ji wî zimanî bi temamî werdigerînin zimanekî dî. Lê dema tu bi demên berê de diçî, tu dikarî li rewşeke cuda jî rast werî. Em bibêjin di sedsala şanzdehan yan hivdehan de helbestek bo kurdî hat wergerandin, belkî yê ku ev kar kirî fikrên xwe jî tevlê kiribin. Wê çaxê tu yê ji vê berhemê re bibêjî 'telîf' an 'werger'? Eger tu bi çavê wergernasiyê lê bimeyzînî tiştekî ku derheqê wergerê de ji te re bibêje heye. Di vê mijarê de xebat û nivîsarên wergernasa hêja prof. Saliha Paker hene. Em dikarin ji bo kurdî jî ji wan sûdê wergirin.

**Dema ji alî tesîr û guherînê de lê dinêrim wergerên kitêbên pîroz û wergerên metnên felsefeya antîk tên bîra min. Rola van wergeran di geşedanên dîrokî de çawa bû?**

Em bibêjin Rojava, welatên rojava ên wan serdeman, pirranî bi zimanê latînî dinivîsandin. Ji aliyê çand û zanistê ve –zanistên ezmanî, ên bijîşkî –ji aliyê mantiqê ve, gelek pêşketî bûn heta sedsala heftan-heştan. Pêşdeçûyî bûn, berhemdayî bûn. Lê serdema navbera sedsala heştan û sedsala dehan wek 'serdema zêrîn' tê hesibandin ji bo Rojhilat, ne ji bo Rojava. Wê çaxê, di dema Ebbasiyan de, gelek tişt ji aliyê tibbê, ji aliyê zanistên ezmanî, ji alî mantiqê, cografyayê û hetta tiştên edebiyatê ve jî hatin wergerandin. Vê piştre ji Rojhilat re û vê gavê dikarî bibêjî ji Îslamiyetê re jî bingeheke zanistî çêkir. Lê mirov tenê wiha bibêje û di ser re derbas bibe, mirov dê heqê wergêran bixwe. Kê ew werger kirin? Bi rastî rola wergêrên Suryanî gelek e di veguheztina zanistê di navbera çandên Rojava û Rojhilat de. Li ser meseleyê, Hûneyn bîn Îshaq û kurê wî û derdora wî gelek ked xwarine. Ew bi xwe bijîşk bû. Lê tiştên li ser mantiqê jî wergerandin. Arîsto jî wan wergerand, bo nimûne. Suryanî pêşketî bûn, ji bilî zimanê xwe bi yewnanî jî zanibûn û bi erebî jî zanibûn. Û dema mirov di wê serdemê de dibêje Ereb jî divê tenê kesên nijada wan Ereb fêm neke. Ew jî di nav çanda Ereban de dihatin hesibandin.

**Wê demê çima dixwestin van wergeran bikin?**

Bi rastî gelek sedemên vê hene, wan jî dixwest çanda xwe xurt bikin û hwd lê ev di wergerê de me dibe ser xaleke pirr girîng: hebûna 'hamî'yan (piştgiran). Wê çaxê rêvebirên Ebbasiyan ji bo ku werger were kirin gelek destekên madî jî dan wergêran û li wan û kar û xebatên wan xwedî derketin û bi vî rengî zanista Rojava derbasî Rojhilat kirin. Rêvebirên wê demê zanibûn ku li Rojava ilm û zanist pêşketî ye û tenê rêyek heye ku xwe bigihînin wê: Diviya ew zanist wergerandana erebî. Helbet rasterast wernegerandin erebî, pêşî wergerandin suryanî û ji suryanî wergerandin erebî. Piştre xwestin rasterast wergerînin erebî yan erebîya wê xurt bikin, carina di ser wergerê re çûn wergerên din sererast kirin. Vê çi kir, vê zimanê erebî jî pêş xist. Ne tenê zanist, ziman jî xurt bû. Tu dibînî ku ew wek xelekekê ye. Çanda zanistê û çanda nivîskî a pêşketî ji Rojava hat veguhestin bo Rojhilat û piştre şaristaniya Rojava pê hesiya ku çandeke wan a wusa xurt û qedîm heye. Lê dê çawa bikirana? Di destê wan de berhemên 'esil nebûn. Îcar çûn ew berhem cardin ji erebî wergerandin zimanên xwe. Piştî vê, di sedsala dozdehan de êdî li Rojava pêşketinê dest pê kir.

**Wergerên ku em ji zimanên biyanî dikin dê xwedî tesîr bin li ser rewş û qedera kurdî?**

Tesîra wergerê berê jî hebû, îro jî heye û sibê jî dê her hebe. Tiştekî wiha heye, Even-Zohar dibêje: "Eger çandek di ciyê xwe de sekinîbe, êdî nikaribe tiştekî biafirîne yan jî di qeyranê de be yan jî pir ciwan be ew çand serî li wergerê dide û gelekî tesîra wergerê li wêjeya wê çandê dibe." Kurdan heta niha gelek kar kirine ku naye înkarkirin, lê ev têrê nake. Niha em dixwazin gelek tiştan bi zimanê xwe bikin. Em dixwazin fîlman jî bikişînin, em dixwazin cûreyên nû ên edebiyatê jî binivîsin. Ên ku bê asteng di van waran de pêşde çûne û xurt bûne hene. Lê ev kêmanî ne tenê tiştekî ji bo kurdî ye, berê îngilîzan jî ji fransîyan tişt wergirtine, fransiyan jî ji elmanan wergirtine. Ev ne tiştekî nû ye ku çandek bi riya wergerê ji yeke dî tiştekî wergire. Werger ji bo kurdî jî pêwîst e ji bo ku zimanê kurdî xurt bibe, eger tu mirovekî afirîner bî dema romanekê dinivîsî da ku karibî qet nebe bê kelem binivîsî. Her wiha pêdivî bi tesîra wergerê heye ne tenê ji bo ziman û edebiyatê, ji bo tiştên zanistî û perwerdehiyê jî pêdivî bi wergerê heye. Ji aliyê din de, werger tiştekî zindî ye, dînamîk e, ji her çandê tiştên pêşketî bi xwe re tîne û derbasî çanda te dike. Lê bêguman ne her tiştê wergerandî...

**Tecrûbeya te ya wergerê jî çêbû û te kitêbek ji îngilîzî wergerand kurdî. Di pratîkê de zehmetiyên wergerê çi bûn ji bo te?**

Bi rastî min dît ku werger tiştekî bi jan e. Ez gelekî ji wergerê hez dikim lê gelekî bi jan e. Wexta hevokekê ji îngilîzî werdigerînî, tu wê hevokê têdigihêjî, tu dizanî ku bi kurdî jî ew çi ye û tu dixwazî wê bi ruhê kurdî bidî fêmkirin. Lê di vir de tiştên dî jî hene, tiştên berî te ku heta dema te wek goga berfê hatine û tiştên ku tu ji wan re tiştekî nabînî. Li ser meseleyê dema min *Girava Gencîneyê* werdigerand tiştên derbarê keştiyan û deryageriyê de hebûn. Belkî ew peyv di kurdî de jî hebûn, ne ku nebûn, lê zêde nehatine bikaranîn.

**Mînaka peyva 'naxuda' tê bîra min di reşnivîsa pêşî a wergera te de...**

Bo nimûne, ew... Min di wir de dîsa xwe dispart kurdî. Dibe ku peyvçêkirin jî stratejiyek bûya lê min got tiştekî di çandê de heyî peyda bikim. Ew peyv di teksteke C. A. Bedirxan de derbas bûbû. Min got ez bibêjim 'kaptan' jî rast e, lê min xwest peyveke kurdî ku di daldeyê de maye dîsa vejînim. Roleke wergerê jî ew e ku dîsa ziman vegerîne ser ruhê xwe. Peyvên ku di qunc û daldeyan de mane dîsa bixe meriyetê. Min 'naxuda' bi kar anî, lê te dî werger pêvajoyek e, piştî ku tu diqedînî diçe ber destên din...

**Welhasil 'naxuda' di edîtoryalê re derbas nebû, ne wisa?**

Na, derbas nebû.

**Tiştekî ku tu werdigerînî yan dixwazî wergerînî heye?**

Piştî *Girava Gencîneyê* min xwest wergera kitêbên polîsiye bikim. Min dest bi romaneke Agatha Christie, *The Murder on the Orient Express*, kir, ez hinekî pêşde jî çûm lê karê akademiyê dest pê kir û ez bêgav mam wê bidim aliyekî. Piştî wê min dest bi wergereke din Çeşmhayeş e *(Çavên Wê)* . Ev romaneke Bozorg Alewî ye. Ez hinekî pê de çûm, lê hîn jî maye.

Bilal Çelik di 2009an de, dema kitêbeke ku 134 sal berê bi îngilîzî hatibû nivîsandin (*Girava Gencîneyê*/ R. L. Stevenson) werdigerand kurdî, dît ku kêfa wî gelekî ji karê wergerê re tê û meraq kir ku gelo zanisteke vê mijarê hebû ku li serê bixebitiya. Piştre li Zanîngeha Okanê di warê wergernasiyê de mastera xwe temam kir û aniha li Zanîngeha Boğaziçiyê di heman beşê de doktorayê dike. Dema min li konferanseke wergernasiyê a li vê zanîngehê dît ku metnên kevn ên kurdî ji girseyeke nijadtêvêl re pêşkêş dike, ez şa bûm ku kurdiya xerîb û birîndar li nav salonên akademiyê bejna xwe bilind dikir. Ez pê re li pey serpêhatiya dûdirêj a wergerê çûm û li ser yek ji têkoşînên herî girîng ên zimanê kurdî, bizava wergerê, ketim guftûgoyê.

## Berê bêtir çi dihatin wergerandin?

Ji bo kurdî em lê bimeyzînîn, têkiliya kurdî bi farisî û erebî re hebû û tiştên olî, edebî, zanistî dihatin wergerandin. Tabiî mirov bi giştî lê bimeyzîne, her demê tiştên pêşdetir hebûn. Em bibêjin demekê Omer Xeyam di rewacê de bû, wê hingê bêtir rûbaîyatên wî dihatin wergerandin. Piştre dema îroyîn wek mînak romanên polîsîye li pêş in û reng e bêtir ew bên wergerandin. Di wergerê de faktoreke girîng heye, divê mirov li ser wê bisekine, ew jî agent (ajan, kiryar) in ku bi saya wan têkiliya navbera ziman û çandan xurt dibû.

**Kî ne ev agent?**


Ew têgeh ji aliyê Even-Zohar û Toury ve hatiye berpêşkirin. Agent ew kes in ku meqsedeke wan heye, dixwazin di çanda xwe de guherînekê pêk bînin, ji bo wê bi zanebûn diçin ji çandên din berheman werdigerînin bo çanda xwe û li gora wergera ku wan kirî jî çanda wan diguhere û pêşketinek encam dide.

**Wê çaxê her wergêr *agent*ek e?**

Na, her wergêr ne *agent*ek e. Gelek werger tên kirin, tu dibînî, lê ti tesîra wan li ser çanda wan jî nabe. Divê li vê bê nêrîn: werger bûye lê ti guherînek bi xwe re aniye? Yan jî tiştek veguhestiye? Yan jî tiştê ku veguhestiye ji alî çandê ve hatiye qebûlkirin û cardin hatiye hilberîn? Evana jî muhîm in.

## Li Endulusê karên muhîm hatin kirin...

Li Endulusê ne tenê misilman, cihû jî hebûn û mesîhî jî hebûn. Di nava çandan de têkilî çêbûn. Bi rastî werger kengî dest pê dike? Dema çand li hev biqelipin, têkilî xurt bibin, li wê derê werger jî xurt dibe û rola wergerê jî derdikeve holê. Bo nimûne, çima îro li Îsraîlê teorîyên wergerê pêşketin? Wextê ku xwestin çanda xwe xurt bikin, dîtin ku gelek mirovên wan, ên ku ji Rûsyayê hatin ji çanda rûsî, ên ku ji Elmanyayê hatin ji çanda elmanî, gelek tişt bi xwe re anîne. Ji bo ku zimanê xwe yê ibranî pêşde bibin ji berhemên di zimanên rûsî, elmanî û hwd de sûd wergirtin. Di wan de mirovên şareza jî rabûn li ser van karên ku dihatin kirin û li ser vê dînamîzmê difikirîn jî teorî ava kirin. Li ser meseleyê, Even Zohar teoriya polysystem (pirpergalî) pêş xist. Vê teoriyê şanî me da ku li gor serdeman hin tişt populer in û li navendê ne, hin tiştên dî jî li qiraxê, li qunc û daldeyan dimînin, lê van tiştên di quncan de her tim tiştên nûjen di hundirê xwe de dihundirînin û bi guhertina mercan re dikarin bên navendê û bibin xwedî bandor.



Vexwarina qedim ya gelê qedîm;

# Şaraba Suryaniyan her ku dimîne xweş dibe



NÛJÎN ONEN

DEMA qala şarabê dikin, herêmên Bordeaux û Bourgogne yên Fransayê tên bîra we, lêbelê tama Şaraba Suryaniyan a ku li Midyada Mêrdînê tê çêkirin jî qasî şaraba Fransiyan xweş û biqelîte ye. Şaraba ku Suryaniyên li Midyadê di malên xwe de çêdikin û weke tiştekî pîroz qebûl dikin, ji sala 2003'an ve di şarabxaneyeke profesyonel de tê hilberîn. Serokê Komeleya Yekitiya Suryaniyan Yuhanna Aktaş, di şarabxaneya ku di sala 2003'an de ava kir, şarabên Suryaniyan hildiberîne. Aktaş dibêje, "Di nava tiştên vexwarinê de tenê şarab wek qonaxên jiyana mirovan e" û wiha pê de diçe: "Reçeteyeke şaraba Suryaniyan heye ji şarabên din cuda ye." Yuhanna Aktaş, dîroka şaraba Suryaniyan û qonaxên ku tê re derbas dibe ji Heftenameya Basê re vegot.

**Vexwûreka pîroz a Suryaniyan; Şarab…**

Yuhanna Aktaş, di destpêkê de bersiva pirsa, "Şarab, di civaka Suryaniyan de çima pîroz tê hesibandin?" dide û wiha dewam dike: "Dema ku mirov li dîroka Suryaniyan a li Mezopotamyayê dinêre, diçe beriya 6 hezar û 500 salan. Li Mezopotamyayê beriya Suryaniyan Babîl, Asur, Aramî jî şarabê weke parçeyekê çanda xwe ya gelek girîng dibînin û di malên xwe de çêdikin. Beriya 2 hezar salan bi hebûna Îsa û piştî wê bi derbasbûna Suryaniyan bo Xirîstiyaniyê û bi bikaranîna wê di dêrê de dema ayinan de, şarab pîroz tê qebûlkirin. Îsa jî di xwarina xwe ya dawîn a bi xwandekarên xwe re dibêje, 'Ez ji we vediqetim' û piştî wê pariyekî nan û şarabê dide wan û wiha dibêje, 'Ev nan laşê min e. Şarab jî xwîna min e. Heta hatina min a duyem min wiha bibîr bînin.' Di dêran de heta 2017'an ev rîtuel dewam dike. Ji ber wê yekê şarab bo Suryaniyan pîroz e. Ji xwe ji bilî pîroziya wê, şarab perçeyekî çanda me ye." Yuhanna Aktaş destnîşan dike ku Suryaniyan destpêkê şarab di malên xwe de çêdikirin û dibêje di belavbûna Îslamê re ev çand qels dibe. Aktaş axaftina xwe wiha berdewam dike: "Li Rojhilat gelemperî Ermenî hebûn, lê li Mêrdîn û derdora wê ku em jê re dibêjin Turabdîn Suryanî hebûn û tenê Suryaniyan şarab bikar tanîn. Di piştî sedsala 6'an li herêmê bi belavbûna Îslamê re çanda çêkirina şarabê di malan de kêm bû. Ji ber ku di Îslamê de şarab, weke 'guneh û heram' tê qebûlkirin. Ji ber vê sedemê, bikaranîna şarabê li cem Suryaniyan jî kêm bû. Lêbelê dîsa jî hema bêje di hemû malên Suryaniyan de şarab tê çêkirin. Ji xwe di rezên tirî yên Suryaniyan bi xwe de, nêzikî 10 cureyên tirî hene ji bo şarabê."

**"Reçeteya şaraba Suryaniyan cuda ye"**

Aktaş cûdahiyên şaraba Suryaniyan ji şarabên din wiha vedibêje: "Cudahiya şaraba Suryaniyan ku ji şarabên din vediqetîne, hebûna reçeteya wê ya cuda ye. Taybetmendiya şaraba Suryaniyan ev e; siruştî û organîk e. Xweza, tirî çawa bide me, em jî wisa pêşkêşî mirovan dikin. Em qet madeyeke din bikar nayînin. Demsala çinînê ji 15'ê Îlonê dest pê dike û heta dawiya Cotmehê bi sarbûna hewa re jî xilas dibe. Mînak, berê jinan li malan, libên tirî bi destên xwe ji hev cuda dikirin, paşê dikin satilan û diperçiqandin. Piştî vê yekê, ji bo ku tirî tam û rengê xwe ji qalik bistîne, 2-3 rojan biqalik ve radiwestandin. Madeyeke ekstra bo biriqandin, an rengê wê têkil nedikirin. Piştî 3 rojan dikirin tilîsan, di nava kevirê qewartî de dihat guvaştin. Şireya ku jê dihat, tijî bîdonan dikirin û di bîdonan de qonaxa fermantasyonê destpê dikir. Carînan bêyî midaxele, heftiyek an du heftiyan dihat kelandin." Ew ava tirî, piştî 10 rojan ku dihat meyîn, derbasî qonaxa veguhastina şarabê dibû. Paşê tijî amanan dihat kirin û 1-2 mehan di wan amanan de devê wan girtî dihatin hiştin. Û Suryanî ji berê vir ve şaraba ku di mehên Îlon-Cotmehê de hildiberînin, şeva sersalê vedixwin. Di demên dawîn de ev yek êdî di malan de hat kirin. Piştî ku Suryaniyên li herêmê koçî Ewropayê kirin û hejmara Suryaniyan li herêmê kêm bû, yên mayî êdî li şûna cihên çêkirina şarabê yên li nav rezan, li malên xwe çêdikin. Herwiha rez û teknîkên çêkirina şaraba me siruştî û organîk in. Jibilî ava tirî, tiştekî din nayê bikaranîn. Hewa û mînarelên di axa herêma me de, çêkirina şarabê hêsan dikin. Ji ber ku li herêma me rêjeya rewayê (nem) kêm e û hişkayî ye, pêwîstî bi bikaranîna tu madeyên din namîne. Herwiha ji ber ku şarabên li vê herêmê tên çêkirin siruştî ne, nabe sedema serêşê jî."



> "Armanca Îsa ya bikaranîna şarabê ev bû; Qonaxên jiyana mirovan û yên tirî weke hev in; Mirov tê ser rûyê cîhanê, dikemilin, pîr dibin û ji jiyanê vediqetin. Tirî jî di van qonaxan re derbas dibe û dibe şarab"

**Şarab çawa tê parastin?**

Li hêla din Yuhanna Aktaş dibêje ji hemû cureyên tiriyê reş, şarab nayê çêkirin û axaftina xwe wiha didomîne: "Em ji tiriyê ku em jê re dibêjin, 'hinve Kome' û bi Tirkî jî jê re dibêjin, 'boğazkere' şarabê çêdikin. Ji her tiriyê reş şarab nayê çêkirin. Nemaze jî ji ber ku rêjeya şekirê di tiriyê 'hinve Kome' de zêde ye, şaraba wê jî pir biqelîte ye. Ev tiriyê herêma Mêrdînê ye. Em herî zêde tiriyên boğazkere û öküzgözü bikartînin." Aktaş li ser parastina şarabê jî wiha diaxive: "Divê di germahiya odeyê de bên veşartin. Berê di bin malên hemû Suryaniyan de jêrzemîn (mexzen) hebûn. Ev jêrzemîn havînan hênik, zivistanan jî germ bûn û ji bo germkirin û sarkirinê pêdivî bi tiştekî nebû. Ji ber ku dîwarên wê zitûr in û ferqa cudahiya di navbera germahiya hindur û derve gelek kêm e. Divê şarab berwarkî bên danîn. Sedema vê jî, divê karokên bi devê şuşeyan ve tim şil bin. Dema ku karok û şarab tim ji hev bigirin, karok mezin dibe û bi vî awayî li pêşiya têketina hewayî dibe asteng. Hewa dijminê sereke yê şarabê ye. Dema ku hewa ketê, şarab ji jiyanê vediqete, mîkroorganîzmayên zindî yên di nav de dimirin, ji şarabbûnê derdikeve û dibe sîrke."



## "Piştî 3 sal û nîvan destûr dan"

Di dirêjiya axaftina xwe de Yuhanna Aktaş, dibeje ji bo çanda şaraba Suryaniyan ji nav neçe, wan biryar da ku şarabxaneyê ava bikin û ev prose wiha vegot: "Ji ber ku şêniyên herêmê bi giştî misilman in, ne hêsan bû ku em şarabxaneyê vekin. Qebûlkirina şarabê weke 'heram' gelek zorî da me, tevahiya der û dorên me misilman bûn û gelek baş li vî karî mêze nedikirin. Ji ber wê yekê malbatên me jî bi germî pêşwaziya avakirina şarabxaneyan nekirin. Piştî ku me ev yek ava kir, me hem hosta nedît û hem jî ji bo ku em ê bo şarabê bikar bînin, hin kesan tirî nedifirotin me. Di burokrasiyê de jî me heman kêşe û astengî dîtin. Hin karmendan di çêkirina ewraqên me de astengî derdixistin, wisa hîs dikirin ku bi îmzekirina ewraqekê dibin şirîkê gunehekê. Bi vî awayî em 3,5'an pê re mijûl bûn û me destûra firotin û belavkirinê wergirt.



## "Qonaxên jiyanê yên mirov û ên tirî weke hev in"

Dema ku mirov dibêje şarab, gotina 'bi salan re xweş dibe' tê bîra mirov. Aktaş sedema vê yekê jî wiha rave dike:

Bingeheke vê sedemê ya olî û dîrokî heye. Termînolojiya ku bo mirovan tê bikaranîn, ji bo tirî jî eynî ye. Mînak ji bo şarabê jî dibêjin; biçûk, ciwan, kemilî, pîr. Sedema bikaranîna şarabê ji aliyê Îsa ve di şîva dawîn de ev bû; Qonaxên jiyanê yên mirov û şarabê weke hev in û tirî di nav qûtan de tenê ye ku qonaxên derbas dike wek yên mirovan e. Mirov tên ser rûyê cîhanê, mezin dibin, dikemilin, pîr dibin û ji jiyanê vediqetin. Di tirî de jî heman qonax derbasdar in. Di mêwê de ewilî, bisîre (koruk) jîn dide. Qonaxên wê bisîreyê jî hene weke yên mirovan. Zaroktî, ciwanî, kemilî, kalbûn û rojekê em wî tirî ji mêwa wê jê dikin, diperçiqînin û dawî li jiyana wê tînin. Bi dawîbûna jiyana tirî, vê carê şarab jîn dide. Çawa ku hindî mirov bijî dikemile, şarab jî hindî ku bimîne digihêje û xweş dibe. Ji ber wê yekê hindî ku şarab bimîne tama wê xweştir dibe. Ji ber vê sedemê ji şarabê re 'tekana qûtê zindî' tê gotin. Şarab her tim zindî ye; di hindur de mikrorganîzma hene. Li deverên ku mirov lê dijî, herêma ku bedena mirov lê aramiyê dibîne, ew jî aram e."

